

Keça Kurd

# ZAYENDA MÊ Û NÊR

Lêkolînek di giramera zimanê  
Kurdî de

Kurmancîya Bakur

Pirojê Kurdologî li Zankoya Azad ya Berlin  
Weşanên Kovara Havîbun  
Zincîra Vekolînên Kurdi

Keça Kurd

ZAYENDA MÊ Û NÊR

Lêkolînek di giramera zimanê  
Kurdî de

Kurmancîya Bakur

Berlin 2001

Keça Kurd

ZAYENDA MÊ Û NÊR

Lêkolînek di giramerâ zimanê Kurdî de  
Kurmancîya Bakur

Çapa yekê

Berlin 2001

Ji weşanên kovara Havîbûn (9)

Mafê çapê parastîye

Navûnîşan:

Freie Universität Berlin  
Havîbûn  
c/o Kurdistan-AG  
Otto-von-Simson-Str. 23  
14195 Berlin

saradistribution.com  
info@saradistribution.com  
Phone/ Fax +46 8 33 12 29  
Stockholm - SWEDEN

## NAVEROK

Şaristana zimên.....	7
Pêşgotin.....	10
Zayend.....	14
Alavên mî û nîr.....	15
Pronav.....	15
Veqetandek.....	23
Tewang.....	30
Malbata laş.....	34
Can.....	38
Deng.....	39
Mirov bi karê xwe navdibe.....	40
Nexweşî.....	41
Derman.....	41
Çapemenî.....	42
Reng.....	42
Erd.....	43
Ax û lêçûna wê.....	45
Xanî.....	45
Cih, gund, bajar û welat.....	46
Ciya, ban û newal .....	47
Çarrex.....	49
Cihêñ çandiniyê .....	50
Dar û beşen wê.....	51
Malbata giya.....	51
Berê şînî.....	52
Malbata gul û kulfikan.....	52
Sitirî û quncir.....	53
Malbata zad.....	53
Genim.....	53
Qaşıl, navik û dendik.....	53

Navên xwarinan.....	54
Bêjeyêن sipî.....	54
Qafêن malê.....	55
Hêsincaw.....	55
Alavêن hêrtinê.....	56
Haletê kevin.....	56
Raxistina malê.....	57
Mû û pirc.....	57
Tevn û rîs.....	58
Bar û piştî.....	58
Cil û berk.....	59
Pêwistiyêن malê (modêrn).....	60
Alavêن guhestinê.....	60
Cekêن şer û kuştinê.....	60
Binyata makderê û paşgira (ek).....	60
Leyistik.....	61
Pîsî û gemar.....	61
Asman.....	62
Hewr.....	62
Ba .....	62
Agir.....	63
Dem.....	63
Pîvan û kêşan.....	64
Biçûkkirin.....	64
Navên razber.....	65
Pesn, gileh û guneh.....	66
Makder.....	67
Gotina dumil (gotina cot).....	67
Dumiliya nediyar.....	81
Hejmarnav .....	83
Hejmarnavêن şikestî.....	89
Serkanî.....	91

## Ş A R I S T A N A Z I M Î N

Ziman di navbera mirovan de, alaveke têgîştinê û axavtinê ye, ew ji zayina çalakiyên mêjiyên gelan e, û berhemekê jîndar e.

Lewre ziman, di jiyana miletan de, aliyekî herî giring û şaristanî, têye hajmartin.

Ziman her dem dikeve bin bandora jiyana civaka mirovatiyê, ew bi civaka xwe re, pêşde dice û li gor heyam û mercên dîrokî, yên gelê xwe, gavêن xwe derpêş davêje, û pêşketina civaka xwe, bi zanistî dipejirîne.

Her zimanek sêstemeke dînamîkî ye, ew bi awakî hemdemî guhêzbar e, lê riwesta guhertin û pêşketina wî,

hêdî, hêdî ye, lê hemî endamên terma zimên, di pêvajokê de bi yek lezbûnê, bi yek şewazê, pêşve naçin.

Lewre jî, tu ziman li cihanê nîne, ku ew li derveyî çarçewa yasayêن pêşketina civakî, zanistî, û mercên gelempêر, jiyana xwe diborîne.

Zimanê me jî, bi dîroka gelê me ve, kît bestaye, lê mixabin, rûpelên mêtjûyê miletê kurd, bi hemî aliyêن xwe ve, tijî bûyerêن bêzarî û bextreşî ne.

Bi rexberî vê rewşê re, zimanê me jî, di nav bahozên dirinde û hovandine, têra xwe, setemkarî, bindestî, bi mebesta pişavtina wî, dîtiye.

Lê tevî van serbûyerêن awerte, zimanê kurdî, bi pêdarî û rûmetî, di sîbera yasayêن xwezayî û ne xweserî de, serê xwe rakiriye, û têkoşîna xwe, ji bo parastina hebûn û pêşveçûna xwe berdewamkiriye, û hîn jî, berxwedana xwe didomîne.

Erê, Xweparastina zimanê me, rûdanekê erêni ye, û berjorhildana ala şaristanî i pîroz e, û ewa dillêketina gelê me bi xwe ye.

Lê, pêwiste bê gotin jî, ku zimanê me, wek me, li jorê jî, nîşankiriye, ji ber sedemên xweyî û hawîrdorî, xwe ji pir rûdawêن neyînî rizgar nekiriye.

Hebûn û bikaranîna sê zaravêن cudayî û du corê alêfbayan, di zimanê me de, derdêkî pir mezin e, û ew, jîrûdawêن neyêni, mînakeke gesdar e. Ji ber vê jî zimanê dê û bavê me, bê aramî, çaweriya çarelêkirina aloziyêن xwe dike.

Mamosta Keça Kurd, di vê pirtokê de, destê xwe deydine ser cihêseke terma zimanê me, û ewa berxwedide, ku bi nirîn û şirovekirinêن zanistî, wê kûlê derman û çareser bike.

Bi rastî jî, „Zayenda mî û nîr“ di zimanê me de, ne

herdem bi yek şewe û rîbaz hatine nivîsîn.

Nivîskarêne me, yên kevneşopî û yên serdema me nihajî, ketine û dikevin dijberiyekê, ango carna zayenda mî dikin nîr, carna jî nîr dikin mî û hin caran jî, navekî bi du zayendan bikaranîne û bikartînin.

Vêce zimanzana me, Keça Kurd lêkolîneke zanistî, di vê berhemê de dike, û bi bawerdanên zimanevanî û balkêş, dijberîyan li nik wêjevanên me, yên gewre E. Xanî, M. Cizîrî, Celadet Bedirxan, di zayenda mî û nîr de ronî dike, û bi şewakî giştî, encamên kîrhatî û zanistî, di derbarê mijara „mî û nîr“ de, li pêş çavêne me rîdixe.

Di baweriya me de, ev pirtûka dikare şûneke zor giranbuha di nav cihderên zimanewanî, zanistî de bistîne, û roleke bercav û payebilind di çareserkirina janekê ji janêne zimanê me de bilîze.

Herwisa jî, ev berhema dikare ji lîgervan, nivîskar û xwendevanên zanîngehêne kurdî re, bibe çavkaniyeke pêwist û suddar.

Li dawiyê, em hêviya serkevtinên duhatî, ji nivîskara hêja Keça Kurd re dikin.

Dr. Ebdilmecît Şêxo

20. 5 .2000

## PÊŞGOTIN

Zimanek pêş na keve, eger civaka wî ne pêşketî be. Milletek jî pêş na keve, eger ne azad be û dewleta wî nebe. Zimanê ku dewlet pê diaxive, dibe zimanê dibistanan û yê zanîngehan, dibe zimanê çand û çapemenîya wî welatî. Û di rêya civata zanyarî a zimanzanî, ya ku dewlet alikariya wê dike, hemî pirsgirêkên ziman çareser dibin.

Bi vî awayî ziman xwe pêşde dibe, xwe digihîne astê jiyanâ şaristanî û pîşesazî ya ku gelên cîhanê pê gihane.

Zimanê me, zimanê civakeke bindest e, bê dewlet e, û ne azad e. Di Kurdistanê de, zimanê me ne bû ye zimanê dibistan, çand û çapemenîya gelê Kurd. Her û her ev ziman

qedexe bû ye; li dezgehêñ fermî jî mirov bi aşkere nikare pê bi axive.

Nivîskarê kurd di mala xwe de, bi çavêñ tirs û destêñ lerz bi zimanê xwe dinivîse. û ji ber van hoyan, zimanê me li paş maye. Her heman hoyan hiştîye, ku zimanê kurmancî „kurmanciya bakur“ li demeke gelek dirêj tenha zimanê axivtinê be. Ji lewra jî, em dibînin ku zimanê devokan serdest bûye; destûr û bendêñ rîzimana kurmancî yek nagirin.

Li roja îro di nav berhemêñ her nivîskarekî de rengê devoka devera wî belo dibe; nivîskarek ((pora min û pişta min)) dinivîse û yekî dî jî „porê min û pişte min“ dinivîs e; yek mî û yek jî nîr dibêjin û dinivîsin.

Di vê qunaxa îro de gereke em bixebitin û her yek li gora karîn û zanîna xwe li dora rehêñ ziman û rîzimana kurdmancî bixepêre, da em bikarin zimanekî yekgirtî (mebesta min kurmanciya jor e) pêk bînin, ku bi yek şewe û yek rîzmanê bête nivîsandin.

Vêce ji bo van pirsgirêkan, di mijara „zayenda mî û nîr“ de, ez jî vî karê biçûk ji xwendevan û nivîskaran re pêşkêş dikim. Dibe ku ne karekî ji sedî sed rast jî be, lê ez hêvî dikim ku ev berhema min a biçûk, wê sîdber be û cihê dilrehetîya gelekan be.

Paş lêgerîn û vekolîna min di gulistana zimanî de, ez gihame encamekê; ku navdêrên zimanê kurdmancî û ew bêje û gotinêñ zayenda mî an jî a nîr distînin, li ser malbatan parve dibin.

Wekî çawe mirov here gundek û li malbatêñ wî gundi binêre; her malek ji serok (malxwê) û hin jin û hin mîr pêk têt, hin mal jî hene ku kebanîya malê heye, di mala wê de hin nîr, hin jî mî hene. Mal heye hemî endamêñ wê nîrin, û mal jî heye hemî endamêñ wê mîne.

Di laş de nîr û mî hene. Laş, serokê malbata xwe ye,

ci endamê ku serxwebûnek heye û dikare bi karekî rabe, zayenda nêr standiye. Lê ci endamê, ku ji laş cuda nabe û nikare bi tena xwe bi karekî rabe, zayenda mêt standiye. Telî ji vê bendê derin; li gel ku serxwebûneke wan jî heye, zayenda mêt distînin.

Di asmanî de du malbat hen e, wekî bav û kur wehane asman zayenda nêr distîne, lê roj, heyv, stêr keskesor, zayenda mêt distînin. Ewr jî kurê asmanî ye, zayenda nêr distîne, lê hemî ew tiştên ji ewr dirjin „baran, berf, teyrok, av û birûsk...“ zayenda mêt distînin.

Min di vê nivîsandina xwe de, navdêr û bêjeyên zayenda mêt û nêr distînin, li ser çend malbatan par ve kirine. Û wekî berê jî min got ku; di hemî malbatê navdêran de weke di malbateke mirovî de, serok an jî malxwêyê malbatê, zayenda nêr distîne, an jî serok kebâniye, û di malbatê de hin ji navdêran zayenda nêr û hin jî zayenda mêt distînin.

Vêce mirov dikare zayenda navdêrên her malbatekê bi hêsanî nasbike; wekî çawe mirovekî gundî hemî malbatê gundê xwe bi mêt û jinêwan ve nasdiike.

Di şînî (şînatî) de çend malbat hene û her yek ji wan, taybetiyên xwe di zayendê de hene; kurdmancan zayenda nêr û mêt di şînî de ji xurtî birine, şînîyê ku jipê (şîpya) sekinîye û pinê wî serdestî berê xwe ye, berê wî şînîyî zayenda mêt distîne, wek bacana reş a sor û îsot. Lê ew pin ((lem))ê ku li ser erdê pan dibe û berê wî pinî (lemî) serdestî wî ye, berê wî jî nêr hatiye, wek şebeş, gundor, xiyar. Di dara şîn de jî besên lawaz (pel û ber) zayenda mêt distînin, lê besên xurt „ra, qurm û çiqil“ zayenda nêr distînin...

Di vê mijarê de jêdera herî giring ya ku min pal daye ser û jê sûd wergirtiye kovara Hawarê bû. Nemaze di nivîsandina alavan (veqetandek, pronavên işarkî û...) û şirovekirina wan de. Di vê barê de, Celadet bingehek hêja

ji me re hiştiye. Lê çi Hawar be, an jî jêderên dî bin jî, gelek bi kurtî li ser zayenda mî û nîr hatiye nivîsandin. Vêce ez vegereham zimanê xwe, yê ku ji dê û bavê xwe hînbûme û ew kultûra ziman ya ku ji civate bavê xwe û hevalên wî di xwîna min de hatibû çandin. Bavê min û hevalên xwe, ji ava deşt û zozanê Kurdistanê vexwaribûn, çîrok û serpêhatiyêن wan jî ji nav derûnê şikevt, berih û beristarkan bûn.

Ez sipasiya mamosta Arif Zêrevan û Selam Ni`manî dikim ku li cara pêşî, rênivîsa pertokê ji min re serast kirin, û li ser têbîniyêن hêja Arif Zêrevanî min pertok ferehtir kir.

Berêz Dr. Ebdilmecîd Şêxo jî xwend û hin têbînî jî, ji min re nivîsibûn ku mirov jê sûd werdigirt. Dema ez gihame raya dawî û ji berî ez li çapê bidim careke dî, min destnivîsa xwe ji Dr. Ebdilmecîd Şêxo re rêkir, ewî careke dî rênivîsa pertokê, nemaze di nuqteşanan de serast kir. Ez jî gelek sipasiya wî dikim.

Bê alîkariya karmendêن kovara (Havîbûn) min nedikarî ez vê pertokê li çapê bidim, ji bo wan jî gelek rêz û sipas. Sipas û rêz ji bo hêja Hoşengê Osman Sebrî; bi rastî alîkariya wî jî di çapa vê pertokê de gelek heye. Herweha ez sipasiya hemî wan kesan dikim, yên ku ci gelek û ci hindik alîkariya min kirine.

Keça Kurd  
27. 04. 2000  
Dortmund, Elmania

## Z A Y E N D

Celadet Alî Bedirxanî bêjeya zayendê nêr danî ye, li destpêkê û li ser şopa Celadet Alî Bedirxanî, min jî zayenda nêr bikar tanî, lê dema ez di nav de kûr bûm, min dît ku a rast, zayend mê ye, ne nêre. Zan, an jî zayin, wek nav û wek makder, bi kar têt û navdêra wê mê ye.

Mînek: *Zana çêleka me dijwar bû, ew ji mirinê rizgar bû.*

Li vir em dibînin ku (zan) mê ye, û ji ber vê jî divê zayend jî mê be; ji ber ku, gotina zayendê ji zan û zayinê hatiye.

Mînekek dî jî: Gotina *xwarin*.

*Xwarina me xwes e.*

*Ez dixum, ez xwarinê dixum.*

Gotina didoyê, ku *xurînî* ye, ew jî mê ye, *ezê xurîniya xwe bişkênim*, ango ezê hinek xwarin bixum.

Di raya min de, xurînî ku navek e û ji xwarinê çêbuûye, û wek wê jî mê ye. Zayend jî navek ji zayin (zan) çêbûye, û divê wek wê jî mê be.

û bi vî rengî çend nivîskarên kurmancî, yên ku bi lêkolînên zimanevanî ve mijûl dibin, gotina zayendê, mê danîne. Ji wan zimanzanan:

Qenatê Kurdo (*Gramera zimanê kurdî*)

Arif Zêrevan (*Bingehêna rastnivîsandina kurdiyê*)

Jotyar Bamernî (*Rêzimana elmanî-kurdî*).

## ALAVÊN MÊ Û NÊR:

- 1- Pronav
- 2- Rengdêrên işarkî
- 3- Veqetandek
- 4- Tewang

### 1- PRONAV

- a- Pronavê işarkî
- b- Pronavê xwemalî

Celadet Bedirxanî weha binav kiriye, ku bi Engilîzî pronomen jê re dibêjin, herweha bi Elmanî jî, her ew gotine.

### ZAYENDA PRONAV

Celadet zayenda pronavî mê dibîne, lê bi raya min ew nêr e; ji ber ku, ev navdêr ji du gotinan (pro û nav) pêk hatiye, di kurmancî de her û her zayenda navê mebest tê standin; û zayenda gotina „nav,, nêr e, lewre pironav jî gereke nêr be.

Bi kurmancîya başûr (Soranî) ji pronavan re cênav tê gotin; eva ha dibe xwemalî, ango bi zimanê kurdî cênav serrasttire.

## PRONAVÊN ÎŞARKÎ

Ev Pronavêni ha li cihê navdêrên mirovek, ajelek û tiştekî têñ; her û her navê kesê sêyem distînîn û dema dikevin şûna wan navan, wan bi îşaretkirin şanî me didin. Celadet van pronavan bi du texlîtan belo dike:

- 1) PÎVENE: Ev, ew.
- 2) QERSENE: Yê, ya, yêñ.

Eva dawî (yêñ) ji bo gelejmara mê û nêr e.

Ez li pey van-herdu gotinan „pîvene û qersene“ xebitîm û min gelek dixwest, ku wateya wan bizanim, mixabin min nekarî. Mamosta Arif Zêrevanî jî got, ku li pey wateya wan xebitî bû, lê wî jî nekarî bû, bigehe encamek. Vêce ev du nav ji çi hatine, em nizanin.

## PRONAVÊN ÎŞARKÎ ÈN PÎVENE:

a- (Ev) û (ew), ji beriya ku bêne tewandin; ji bo her du zayendêñ mê û nêr, ji bo yekjimar û gelejmar bi kartêtin.  
Pronavê (ev) ji bo nêzîk û (ew) ji bo dûr.

*Ev hat, ew hat.*

Lê dema têne tewandin bi vî ceşnê xwarê ne:

Vê (evê) û Vî (evî), ji bo nêzîk, wî (ewî), wê (ewê), ji bo dûr.

*Vî û wî, ji bo zayenda nêr bi kartên.*

*Vê û wê, ji bo zayenda mê bi kar têñ.*

Ev herdu pronav li gel lêkerêñ gerguhêz bi kar têñ. Ji ber ku di kurmancî de du rengê lêkeran hene.

- Gerguhêz.
- Negerguhêz.

*Ev hat, ew çû.* Li vir em dibînin ku ew herdu pronav (ev, ew) nehatine tewandin. Ji ber ku, lêkerêñ (hat û çû) li gel pronavê kesî, gurûpa ((min)) bi kar nayêñ; min hat, di kurdî (kurmancî) de nîne.

Gerguhêz, gerekê kirar û bireser dibe, û li gel pronavê kesî, girûpa (min) jî bi kar têñ.

*Cêlekê giya xwar.*

*Azadî ders xwend.*

Cêlek û azad, di van herdu hevokan de kirarin, giya û ders, bireserin. Lêkerên herdu hevokan „xwar û xwend“ gerguhêzin û li dema bûrî li gel pronavêni kesî „min, tu, ew, me we, wan“ wek xwe dimîni „min xwar, te xwar, wî xwar, me xwar,...“

Vêce, ev herdu pronavêni işarkî bi lêkerên gerguhêz re têne tewandin.

Mînek:

*Vî (evî) got, vê got, ji bo nêzîk.*

*Wî (ewî) got, wê got, ji bo dûr.*

*Ez vî dibînim, ez vê dibînim.*

*Ez vê dixum, ez wê dixum.*

Dema ku em lêkera (dîtin) bi girûpa min re bi kartêni, lêkereke gerguhêz e; „min dît, te dît, wî dît, wê dît, me dît, we dît, wan dît“.

*Ez vî dibînim, ew vê dibîne;* (vî) cihê navdêrekê girti ye, û ji bo vê jî pronav, nav lê bûye. Bi wateyeke dî; pronavêni işarkî di şûna navdêran de, cih digirin û wan ji me re didine nîşankirin.

## 2. RENGDÊRÊN İŞARKÎ

Gelek caran „ev û ew“ di pêşıya navdêran de bi lêkerên negerguhêz re têni û dîse wek xwe dimîni.

Mînek: *Ev hesp hat. Ev mehîn hat.* Ji bo yekjimar.

*Ew mehîn hatin. Ev hesp hatin.* ji bo gelejmar.

Bi lêkerên gerguhêz re, tewange dîse wek xwe dimîne, ango têne tewandin.

Mînek: *Ez vî hespî dibînim. Ez vê mehînê dibînim.*

*Tu wê çêlekê dibîni? Tu wî gundî dibîni?*

Û li vir, dema ku li pêşıya nav têni, Celadet rengdêren işarkî nav li wan kiriye. Ji ber ku pronav timî di şûna navdêran de têni, lê evêni ha, ango rengdêr li pêşıya

navdêran hatine.

a) Vê (evê), ev rengdêr ji bo nêzîk û ji bo zayenda mî bi kartêt.

Mînek: *Vê mirovê got. Vê keçê ji min re ne gotibû.*

*Evê (vê) sêvê bixwe.*

*Evê (vê) pertokê bixwêne*

*Min ji evê (vê) jinê re gotibû.*

Mirov, keç, sêv, pertok, li cihekî nêzîk û ji me ne dûr in, zayenda wan jî mî ye.

b) Vî (evî), ev rengdêr, ji bo nêzîk û ji bo zayenda nîr bi kartêt.

Mînek: *Vî (evî) mirovî got. Evî (vî) kurî ez tengav kirime.*

*Vî (evî) hingivî bixwe. Vî (evî) şîrî vexwe.*

Mirov, kur, hingiv û şîr, li cihek nêzîk û ji me ne dûr in.

Zayenda wan jî nîr e.

#### TÊBÎNÎ:

Li vir em dibînin, navdêra mirov carekê mî û yek jî nîr hatiye, ango ji bo herdû zayendan bi kar têt, ji ber ku, eger mirov jinek be, zayenda mî distîne, û eger mîr be, zayenda nîr distîne.

c) Wê (ewê), ji bo dûr û ji bo zayenda mî bi kar têt.

Mînek: *Wê keçê ez xapandim (wê ez xapandim).*

*Wê golikê maka xwe miht (wê maka xwe miht).*

*Wê avê bide birayê xwe.*

*Wê baranê em şîl û pil kirin.*

Keç, golik, av, baran, zayenda wan mî ye, û ne li ber dest in, hinekî ji me dûr in.

d) Wî (ewî), ev rengdêra işarkî ji bo dûr, û zayenda nîr bi kar têt. Navekî dûr nîşanî me dide.

Mînek: *Tu, wî (ewî) gundî dibînî?*

*Wî (ewî) darî bi dest xwe bigre.*

*Wî (ewî) kurî bi xwe re bibe! (wî bi xwe re bibe!).*

*Wî (ewî) kevirî ji rêya xwe rake.*

## MÊJER:

Mêjer, ev navdêr zaraveke ji bo yekjimar û gelejmarê tê gotin. Celadet weha binavkirî ye, lê gotin ji çi hatî ye, ne xuya ye, di gel ku bi şûn de gereham û min ji hin nivîskaran jî pirsî, lê ez negiham encamek da bizanim gotina (mêjer) ji bingehê çi bêjeyê hatiye.

## NAVDÊRÊN KU LI PEY HEV TÊN

Ev navdêr; dema ku ji yek mêjerê bin û yekjimar bin, lê zayenda wan ne yek be, bi du rengan têne hunandin:

a) Yek rengdêra îşarkî li pêşıya navdêra pêşî tête nivîsandin û zayenda wê jî zayenda navdêra paşî ye û navdêra paşî ditewe, lê ya pêşî nayê tewandin.

Mînek: *Tu vî keç û kurî dibînî?*

*Tu vê ga û çêlekê dibînî?*

Di dema niha de, kêm kes hene ku li gora vê rîzimanê, dînivîsin û bilêv dikin. Di raya min de jî, eger em bi kar neyînin, wê baştır be; ji ber ku, rîzimana zimanê me, bê wê bendê jî serast e. û tu pirsgirêk li pêşıya me dernakevin. Yanî, em dikarin bi vî rengê xwarê binivîsin:

*Tu vî kurî û vê keçê dibînî?*

*Tu vî gayî û vê çêlekê dibînî?*

b) Dema du navdêr didin pey hev, ne ji yek mêjerî ne her navdêrek bi rengdêra xwe tête nîşan kirin û yek cihê a dî nagire;

Mînek: *Tu vî hespî û van mehînan dibînî ?*

*Tu vê mihé û van beranan dibînî?*

Di dema iro de, hin ji nivîskaran alavên nîşankî bê (e)yê dînivîsin û hin jî (e)yê pêve dinivîsin, lê bi giştî bê (e)yê di nav axivtinê de bi lêv dikin.

Mamosta Celadet jî, di vê barê de dibêje: "Ev pronavên ha di şiklên xwe ên tewandî de, gelek caran bêî (e)yê têne bi kar xistin: Vî got, vê got, ez vî dibînim, ez vê dibînim.... Lê neêxistina (e)yê çêtir e. Ji ber ko, gava (e) hate

êexistin pronava îşarkî (ew) bi pronavên kesîn (wî, wê, wan) tevlihev dibe“.

Di baweriya min de tîpa (e) ji mêt de .ji pronavên îşarkî ketiye, ne tenê ji nav devokan, belê ji nav pênûsa kilasîkên me û ji demeke dur ve nemaye. Mînek ji helbestên kilasîkî: Ehmedê XANÎ di Mem û Zînê de dibêje:

*Hercî tiştên ku di vê alemê da hene  
Ew peytewên me mirovan in, li ser karê me ne.<sup>1</sup>*  
*Tûtî, ma bî xwe şekir dirêjin!  
Hercî dibînin, wî tiştî dibêjin.<sup>2</sup>*  
*Wê meqsedê muxteser dibînin  
Pabend-i dîbin, gelek dimînin.<sup>3</sup>*  
*Wê amancê kurt dibînin ew  
Linggirêdayî dîbin, gelek dimînin ew.<sup>4</sup>*  
*Lê Sen`etê wî hekîmê dana  
Neqşê ewî Qadirê tuwana.<sup>5</sup>*  
*Wî bed`emelî wekî kilaban  
Barî bike peyrewê sehaban.<sup>6</sup>*

MELAYÊ CIZÎRÎ dibêje:

<i>Newaya mutrib û çengê</i>	<i>fixan avête xercengê</i>
<i>Were saqî heta kengê</i>	<i>neşoyin dil ji vê jengê</i>
<i>Ku katîb dêmê cedwel kit,</i>	<i>şikeste xet muselsel kit</i>
<i>Jî yek herfan mûfessel kit,</i>	<i>kiye vê müşkilê hel kit.</i>
<i>Jî mihra wê şefeq se'dê,</i>	<i>şirîn le'lê şeker we'dê</i>
<i>Dinalim şubhetê re'dê,</i>	<i>ecêbim lê ji vê ce'dê.<sup>7</sup></i>

<sup>1</sup> M. Emîn Bozarsalan (amadekirin). *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Weşanxana Deng, Swêd 1995. Rupel 7.

<sup>2</sup> Jêderâ berê rupel 21.

<sup>3</sup> Jêderâ berê rupel 22.

<sup>4</sup> Jêderâ berê rupel 23.

<sup>5</sup> Jêderâ berê rupel 29.

<sup>6</sup> Jêderâ berê rupel 40.

*Di vê taqê, di vê xanê, me eys û êminî kanê?  
Kesê dest dit ji dewranê, nihalek vê gulistanê.<sup>8</sup>*

FEQÊ TEYRAN dibêje:

*Guh bidêrin niqtê aşiqan  
Da ez bixûnim vê xetê.<sup>9</sup>*

*Ceger qewî bin qaîme  
Izhar bikim vê şehwetê.  
Ma kes xeber nakit li nik  
Nakit qebûl vê xeybetê.<sup>10</sup>*

*Em dê bi vê niyetê  
Herin pişta ayetê.<sup>11</sup>*

*Sêx gote wan libse qebîh  
Dengê keça bikra melûl  
Nadîm bî wê banga sehîh  
Dûrim jî vê sem 'iyetê.<sup>12</sup>*

Mela Ehmedê Batê di Mewlûdê de dibêje:

*Herçi bînit hindî tiştê xwarinê  
Dê mûbarek bit li ber vê xwendinê  
Her cihê lê bête xwendin rehme lê  
Dê melek biben tijî wê menzelê.<sup>13</sup>*

*Serxweş û sukrana wî navê şirîn  
Paşî ba ilhama Rebbel alemîn.<sup>14</sup>*

*Hem bi fermana xweda wê sa 'etê*

<sup>7</sup> Zeynelabidin Kaya, M. Emîn Nazorî (amadekirin). *Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja Nû. Stockholm 1987. Rupel 25.

<sup>8</sup> Jêdera berê rupel 26.

<sup>9</sup> Jêdera berê rupel 53.

<sup>10</sup> Jêdera berê rupel 55.

<sup>11</sup> Jêdera berê rupel 71.

<sup>12</sup> Jêdera berê rupel 80.

<sup>13</sup> Zeynelabidin Kaya (amadekirin). *Mele Ehmedê Batê, Mewlûd*, Weşanên Roja Nû. Stockholm 1987. Rupel 12.

<sup>14</sup> Jêdera berê rupel 16.

*Nûr ji puştê hate nîva cebhetê.<sup>15</sup>  
 Her cihê lê bête xwendin rehme lê  
 Dê melek biben tijî wê menzelê.  
 Serxweş û sukrana wî navê şirîn  
 Paşı ba ilhamâ Rebbelalemîn<sup>16</sup>*

#### PRONAVÊN ÎŞARKÎ ÊN QERSENE:

Celadet Alî Bedirxanî weha binavkiriye.  
 Pronavên îşarkî ên qersene sisê ne: yê, ya, yên. ev pronav li kes, tişt û heywanan bêî (beyî) ku dûr an nîzîk bûna wan bidin zanîn, işaret dikin û di komekê de hergav kirar in û tucaran nabin bireser. her û her pronavê girêkî (ku) dide pey, û jêre jî bireser e.

Mînek: *yê ku hat, birayê min bû*. Yê, navdêreke nêr şanî me dide.

*Ya ku hat, dotmama min bû*. (Ya), di şûna navdêreke mê de hatiye.

#### PRONAVÊN XWEMALÎ (mulkî) „ya“ û „yê“:

Ev pronav ji du pronavan tête pê, pronavekî îşarkî û pronavekî kesîn, bi hevre xwemaliyê belo dikin û li navdêrê ku şûna wan girtine, işaret dikin: ên nêr

*Yê min, yê xwe. Kurê kê çû û nehat? yê min. Tu basa kurê kê dikî? Ez basa yê xwe dikim; yê min çû.*

*Yê wî çû û venegera.*

*Wî basa kurê kê dikir? Basa yê xwe dikir. yê vî, yê vê. kurê kê baş e? Yê me baş e. ji kurê kê re em bêjin?*  
*Ji yê xwe re... Kurê wan serserî ye, yê wan ne serserî ye.*  
 ên mê: *Ya min, ya te, ya wî, ya wê, ya me, ya we, ya wan, ya xwe.*

*Keça kê nexwes e? Ya me. Ji keça kê re em bêjin? Ji ya*

<sup>15</sup> Jêdera berê rupel 18.

<sup>16</sup> Jêdera berê rupel 12.

*xwe re em bêjin...*

*Mala kê şewitî? Ya me. Ev destmala min e. ka ya te.  
Min pénûsa xwe dît, tu jî li ya xwe bigere. Te ya xwe dît,  
ka ya wî? Ya wan, ya me.  
Me çeleka xwe dît, lê ya wan winda bû, û ya we jî mir...*

### 3. VEQETANDEK:

Veqetandek, tîpeke, an jî bêjeyeke biçük e, ku dikeve paşıya navdêran û paşıya wan bêjeyên, ku li şûna navdêran radibin

- a- Veqetandekên pênasîn (hevbindî) (a, ê)
- b- Veqetandekên pronavî (a, ê)
- c- Veqetandeka (î)

(a) û (ê), tîpên pênasîn, veqetandekên hevbendî jî ji wan re dibêjin. Bi van herdu tîpan, mirov zayenda navdêrê nas dike û herûher jî bi dawiya navdêrê ve tê nivîsandin û ti carî jî nabe, ku em veqetandekê ji navdêrê cihê bikin.

(a) ev veqetandek ji bo zayenda mê bi kar têt.

a) NAV Û NAV:

Veqetandeka (a), li dawîya navê pêşî têt. û xwemalî ye.  
Mînek:

*Kurdistana Kurdan.*

*Keça Lewendî gelek sipehî ye. Bîra gundê me ziwa bûye.*

*çeleka Hevindî nexwes e. Hevala Dilêrî hêja ye.  
Dara tuyê bilind e. Xewa Hîm nayê.*

Di van hevokan de, veqetandeka (a) li dawîya navê pêşî, yê ku zayenda wî mê ye, hatiye, ji lewra em dibêjin, ku ev (a) ya ha ji bo pênasîna zayenda mê peyda bûye.

Herweha jî, ji bo em bizanin, ka ev navdêr xweserê kê ye (Kurdistana Kurdan), ango Kurdistan ya kurdan e û ne ya kesî tir e.

### b) NAV Ú RENGDÊR:

Navdêra didoyê, pesneke ji navê pêşî re.  
Mînek: *cêleka nexweş, pênûsa sor, şeva sar, dara şîn, keça hêja, dayika dilovan, mehîna boz, gula sor, ava şérîn, ava tal.*

Veqetandeka (a), di nav çêlekê û nexweşiyê de, hevbendiyek çêkir; ji me re belo kir, ku çêlek, çêlekeke nexweş e.

### c) NAV Ú PRONAV:

Bêguman, li vir pronav cihê navê didoyê girtiye. Vice veqetandeka ((a)) hevbendiyek li navbera nav û pronavî de peyda kiriye. Celadet, ji nav û pronavî re rengdêr gotiye.  
Mînek: *Xweha min ne li malê ye. Keca te mezin bû ye. Mala me li bajarê Qamişlo bû. Hinara we, ber ne girtiye. Keça wê ji mêt ve mêt kiriye.*

### VEQETANDEKA (ê)

Ev veqetandeka ha ji bo zayenda nêr bi kar têt.

### a) NAV Ú NAV:

*Hespê Şêro beza ye.  
Qurmê darê ne bire!  
Kurê Xelo ne li mal bû.  
Qenatê kurdo, zimazanekî hêja bû.  
Welatê Kurdan xweş e.  
(Kurmê darê ne ji darê be, mirina darê nîne.)  
Kerê Silo lawaz e.*

Veqetandeka hevbendî li dawiya van navdêran (ê)ye, û bi wê em dizanin, ku zayenda wan navdêran nêr e.

### NAV Ú PRONAV:

*Kewê min sipehî ye. Kurê te mezin bûye.  
Kirasê wê kurt e. Dengê wî nivz bû, min ne bihîst.  
Serê we ne êşînim. Gayê min pîr bûye.*

Di mîneka dawî de, em dibînin di gotina (ga) de (y)yek

peyda bûye, ew jî ji bo vê sedemê ye: ci navdêra ku li dawî bi tîpeke dengdêr kuta dibe, (y) yek dikeve navbera (a)ya rayî û (ê) ya zayendî, herwekî me di vê mînekê de dît:

*Bayê êvarê sar e; gotina ba jî wek ya ga ye.  
Tirîyê me şérîn e.*

tîpa (y) kete navbera (i)ya rayî û (ê)ya zayendî.

VEQETANDEKÊN PRONAVÎ (a, ê)

Veqetandeka binavkirî dema dikeve pêşıya rengderekê û li şûna wê navdêra, ku berê bas lêkirine weke pronavekî navderekê dinimîne.

Mînek:

*Tu kîjan kumî dixwazî?  
Ez ê reş dixwazim, ango ez kumê reş dixwazim.*

Ez ê reş... Ev (ê) ya ha veqetandek e û li şûna kum hat û ketiye pêşıya bêjeya reş, ku rengdêr e (pesin dike). Ew veqetandeka ku di (kumê reş) de, ya ku bi kum ve ye; me anî û ne bi navdêrê ve me danî. Lê li vir, wê veqetandekê cihê nav jî girt; ji bo vê jî weke pronavek tê dîtin.

*Tu kîjan darî dixwazî? Ez ê stûr dixwazim.  
tu kîjan kîrasî dixwazî? Ez ê dirêj dixwazim.  
Kîjan destmal te dabû serê xwe? Min a sipî dabû  
serê xwe.*

Ji bo gelejmarê jî, ên reş, ên spî, ên kurt, ên stûr... Bi wateya ku em bêjin, kumên reş, darên stûr,...

TÊBÊNÎ: Nivîskarêne „min jî berî niha...“, veqetandekên pronavî (ê, a) û (yê, ya) di şûna hev de dinivîsin û eva ha jî şâşî ye.

Veqetandekên (ê, a) cihê navderek digirin, ya ku di pêşıya navdêra pesn de hatiye. Di bingeh de, bersiva pirsekê ye.

Mînek: *Te kîjan pêlav kirî? Min a reş kirî.*

Veqetandeka (a), di cihê navdêra pêlavê de hat.

*Te kîjan xanî kirî?*

*Min ê kevin kiri.*

*Dîwarê xanî ê kevin xwar bûye.*

Li vir, dîwar kevn e.

*Dîwarê xanîyê kevin...*

Li vir xanî kevn e.

PRONAVÊN (ya, yê):

Carek bi pronavê girêkî re tên:

*Ya ku hat; xweha min bû. Yê ku cû; birayê min bû.*

*Dîwarê xanî, yê ku ketibû, me lêkir.*

Carekê jî li gel pronavêni kesî tên û xwemalî ne:

*Ya min, ya te ya xwe, ya wî...*

*Yê min, yê te yê xwe, yê wî, yê wê...*

*Te kîjan pênûs divê? Min ya xwe divê, min ya te divê.*

TÊBÊNÎ: Hin ji nivîskaran bi rengekî şas têgehiştine, ku dibêjin: Veqetandeka (a) di pey tipa dengdêrê re nayê nivîsandin û bi vî rengî dinivîsin:

*Birayê Xelo yê mezin.*

Lê ez dibêjim, ji ber ku veqetandeka (a) ji navê Xelo cuda ye, gereke; bi vî rengê xwearê bête nivîsin:

*Birayê Xelo ê mezin, nexwes e.*

*Dîwarê xanî ê pêş, xwar bûye.*

*Zimanê kurmancî, ê bakur bi min xwes e.*

*Zimanê kurmancî, yê ku li Kurdistana bakur e, bê guhdan maye.*

*Ez bi kurmancîya bakur diaxivim..*

Di vê hevokê de (kurmanciya bakur), me vegetandeka (ya) nivîsî; ji ber ku ew bi navdêrê ve tête nivîsin. û du tipen dengdêr di rex hev de, û di yek bêjeyê de çenabin. Lê ev neçebûna ha jî ne ji mêj ve ye ku me gotiye li ser ziman giran e û newê nivîsandin dê xweştir be. Di hevoka çarê de, vegetandeka (yê) hat; ji ber ku pronavê girêkî daye pey..

### c- VEQETANDEKA (î)

Ev veqetandek ji bo nêr û mêt bi kar têt.

Mînek: *Kurê min ê jîr. Keça min a jîr.*

Di van du hevokan de belo dibe ku kurek û keçekte min ên jîr hene û hin jî ne jîr hene. Lê dema ku ti berawirdî nebe, ezê bêjim:

*Kurê min î jîr birêz e.*

*Keça min î jîr xwendevan e.*

Û dema pirs bi vî rengê xwarê bibe:

*Zaroyên Hesenî çawe ne?*

Bersiv jî, ê bi vî rengî be:

*Keçekte qelew î ne sipehî heye.*

*Kurekî dirêj î lawaz heye.*

*Bejna Zînê î bilind bedew e.*

*Rûyê Şérîn î gurover sipehî ye.*

Nayê gotin, ez ji bavê xwe re bêjim:

*Bavê min ê baş; ji ber ku min bavek heye, ne dido.*

A rast jî ew e, ku ez bêjim: *Bavê min î baş, bavê min î hêja. Dayika Azad î hêja; jî me re ev firavîna xwes amade kiriye.*

Dema ez dibêjim, kurê min î jîr; ez kesî dî ji zaroyên xwe kêm nakim. Lê dema ez bêjim; kurê min ê jîr; min ev kurê xwe ji ên dî cida kir, bi wateya, ku ewê dî ne jîrin.

### VEQETANDEKÊN NEBINAVKIRÎ (eke, ekî):

Ev veqetandekên ha weku paşgirekê, dikevin paşıya navdêran û wan ji wekhevên wan diveqetînin, belê nehatine binavkirin (naskirin). kesine, tiştine an ajiline nebinavkirî şanî me didin. Du texlît veqetandekên nebinavkirî hene:

1) Yêñ ku, dikevin paşıya wan navdêrên, ku bireserê wan nîne. Ev veqetandekên ku ji (ek) û (in) pêk hatine. (ek) ji

bo yekjimar û ji bo zayenda mî û nîr bi kar têñ û bê tewandin dimînin. Bi wateyeke, dî ev veqetandek dikeve paşıya wan navdêrên, ku hêj bi serê xwe ne û tu bireser li pey wan nehatiye.

*Hespek hat. Mehînek hat. Hespek dihîre. Mehînek dibeze. Pênusek şikest. Dîwarek ket.*

Veqetandeka (in) ji bo gelejmara herdu zayendêñ mî û nîr tête pê.

*Hespin hatin. Mehîmin hatin.*

2) Veqetandekêñ ne nabinavkirî, yên ku bireserek daye pey wan, bi (e) û (î) têne tewandin.

- Rengdêrek dide pey.
- Navek dide pey.
- Pronavekî kesî dide pey.

Eke, ji bo zayenda mî ye. Ekî, ji bo zayenda nîr e.

EKE: Ev paşgir (parkît) ji bo tewandina navdêrên, ku zayenda wan mî ye bi kar têt.

a) NAV Û RENGDÊR:

*Dareke şîn. Mehîneke boz. Şeveke sar. Keçeye baş. Dîyeke dilovan.*

Dar, dareke şîn e, lê ci dar e û ya kê ye em nizanin.

b) NAV Û NAV:

*Şeveke baranê. Keçeye Lewendî.*

Şevek ji şevêñ baranê û keçek ji keçen lewendî; keç mezin e, biçûk e, çawe ye, em nizanin!

*Pertokeke Azadî; pertokek ji pirtokên Azadî.*

*Mirîşkeke pîrê, mirîşkek ji mirîşkên pîrê, lê ci mirîş e, em nizanin!*

*Maleke koçeran. Rojeke Newrozê.*

C) NAV Û PRONAV:

*Keçeye min. çirokeke te. Mêweke wî hişk bûye.*

*Kehnîyeke me ji avê ziwa bû ye. Berxeke wê mir.*

*Guleke min cilmisi.*

EKI: Ev paşgir ji bo navdêrên nenaskirî, yên ku zayenda wan nêr e, bi kar têt. û bi navdêr ve tê nivîsandin.

a) NAV Û RENGDÊR:

*Hespekî boz hat.* Em dizanin, ku ji hespan hespekî boz e, û bihtir em nikarin bizanin; qelew e, lawaz e, an jî ev hesp yê kê ye, em nikarin bizanin. Bêjeya boz, rengdêr e û bûye bireser.

*Darekî stûr ji min re bîne!* Tişta em ji vî darî dizanin, ku stûr e, lê ew kurt e, dirêj e an xwehr e...em nizanin. *Konekî res hebû.* *Nanekî hişk ji bizina xwe re bibe.* *Goştekî sor bikire.*

*xanîyekî bilind, li ser girekî bilind ava kiri bûn.*

b) NAV Û NAV:

*Nêriyekî şivêñ winda ye.* Tîpa (y) ketiye navbera (î) ya rayî û (e) ya parkîtê.

*Me konekî koçeran dît.* Me konek ji konêñ koçeran dît, lê ev kon li kû ye, û xwedîyê wî kî ye, em nizanin.

*Seyekî gund direye.*

*Destekî Gulê şikandin.*

c) NAV Û PRONAV:

*Hespekî min winda ye.* Gelek hespêñ min hene; yek ji wan hespan winda ye.

*Kurekî te ne xuya ye.* *Seyekî wî nexwes e.*

*Dîwarekî wan keti ye.* *Kurekî te ne li mal bû.*

*Mêvanekî me heye.* Mêvanekî me heye, lê ew kî ye û navê wî çiye nexuyaye.

Di van mînekan de û di hemî hevokan de, bireserk heye. û dema bireser hebe, ew navdêrê nenaskirî tête tewandin.

#### 4. TEWANG

Celadet Bedirxan li ser tewangê dibêje:

„Zimanê Kurdmancî zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê de dikevinê. û wezîfa ko li ser digirin têne tewandin û hin parkît bi wan ve dixin, an hin tîpêwan bi tîpine din diguherin“

TÎPÊN TEWANGÊ (ê) û (î) ne

Dema navdêr, kirarê lêkerek negerguhêz be, nayê tewandin.

*Hesp hat. Mehîn hat.*

Hesp û mehîn, ev herdu navdêr di van du hevokan de kirarin. Lêkerê (hatin) negerguhêze; bi wateya ku di dema bûrî de û li gel pronavên kesî û girûpa „min“ bi kar nayê „min hat, di kurdmancî de nîne“.

Tewandina navdêran di van çend xalên xwarê de belo dibe:

1) Dema navdêr bireserê lêkerekî gerguhêz be û di dema niha de be, tête tewandin.

*Ez hespî dibînim. Ez mehînê girêdidim.*

Hesp û mehîn di van du hevokan de bireserin. û lêkerêni bi kar hatine, bi herdû gurûpê pironavên kesî re (ez û min), bi kar têr û di dema bûrî de li gel girûpa (min) gerguhêzin; „min dît, te dît, wî dît, me dît, we dît wan dît“ min mehîn girêda, te girêda, wî (wê) girêda, me girêda, we girêda, wan girêda. Li gel hemî pronavên kesîn yên girûpa (min) wek xwe man û nehatin guhertin.

*Ez hespî dibîm, ez mehînê dibîm.*

*„min bir, te bir, wî bir, me bir, we bir, wan bir“*

2) Bi lêkerêni gerguhêz re û di dema wan a bûrî de kirarêni wan têne tewandin û bireser weke xwe dimînin û nayêne tewandin.

Mînek: *Zînê sosin dît, hespî ceh xwar, çêlekê giya*

*xwari bû, Zarokan pencere şikêñand; ev mînek ji bo gelejmarê ye.*

Lêkerê (dîtin), lêkerekî gerguhêz e, ango ev lêker li gel hemî pronavên kesî „min, te, wî, wê, me, we û wan“ wek xwe dimîne; min dît, te dît, wî dît, me dît, we dît, wan dît. Li van mînekên xwarê binêrin.

*Hesp cehî dixwe.*

Di dema niha de ye û hesp kira re. Navdêrê ceh bireser e û di dema niha de, eger lêker gerguhêz be, bireser tê tewandin.

*Hespî ceh xwar.*

Hesp kirar e, lê di dema bûrî de ye û lêkerê (xwarin) gerguhêze; ji bo vê jî, kirar hatiye tewandin û bireser wek xwe ma ye.

*Hesp hat.*

Hesp kirar e, lê ev hevok bê biresere û lêkerê (hatin) negerguhêz e, ji bo vê jî, em dibînin ku kirar nehatiye tewandin.

(ê) Ji bo zayenda mê bi kar têt.

Mînek: *Siha darê xwes e. Ez darê dibirim. Ez hêkê dişikênim.*

*Hespê min çû nav garanê.*

*Vê gemarê ji vir rake.*

Li vir jî û di van mînekan de, em dibînin ku lêkerên bi kar hatine gerguhêzin; li gel ku bi gurûpa ez re bi kartên, bi gurûpa min re jî bi kartên: „min şikand, te şikand, wî şikand, me şikand, we şikand, wan şikand“. Di mînekên jor de (ê) ji bo zayenda mê bi kar hatiye.

(î) Ji bo zayenda nêr bi kar têt:

Mînek: *Ez genimî diçênim.*

*Ev hevsarê kerî ye.*

*(Vî kerî li vî borî derbaske!)*

Genim, ker û bor, bi (î)yê, ku tewanga zayenda nêr e hatine

tewandin.

3) dema navdêr bireserê navdêrekê be, tê tewandin.

*Ev goştê cêlekê ye.*

*Ava golê şérîn e.*

*Ez êmê hespî amade dikim.*

çêlek û gol û hesp bireserên godt, av û êm in, ji ber vê jî em dibînin ku hatine tewandin.

4) Eger di nav navdêran de típek ji van herdu típan (e) û (a) hebe, ew herdu tip bi (ê) yekê têne guhertin û navdêr ditewin.

Lê di dema îro de û di axavtinê de; nemaze tewanga navdêra nêr berew neman diçe. Û Mîr Celadet jî di vê barê de dibêje: ...dixuye ko di navdêren nêr de meyldariyek e zimên ber bi terikandina tewanga wan a yekjimar e; nemaze şiklê pêşîn. Ji lewre her sê şikilên jêrîn rastin.

*Soro ji kevirî ket, Soro ji kêvir ket. Soro ji kevir ket.*

*Gurgîn cû aşî. Gurgîn cû êş. Gurgîn cû aş.*

#### NAVÊN HEYBERÊN CANLIBER:

Celadet Bedirxan dibêje: (Di heyberên canliber de, carina mî û nîrê wê heyberê bi bêjeyine cihê û serbixwe têne nîşan kirin.)

#### MIROV:

Kurmancan bêjeyên serbixwe jî mirovan re danîne ku zayenda mî û nîr ji hev cuda dikan.

Her wekî di bêjeyên jêrîn de:

Mê	Nêr
Dê	Bav
Keç	Kur
Xuh	Bira
Pîrik	Bapîr
Metik	Mam

Metik xweha bav e. û mam jî birayê bav e.

Dotmam > Pismam

Birazê (keca birê) > Birazî (kurê birê)

Xwarzê (keca xwehê) > xwarzî (kurê xwehê)

Xesû > Xezûr

Diş (xweha jinê û ya mîr)

Tî (birayê mîr)

Bûra (birayê jinê)

#### AJEL:

Di ajelan de jî bêjeyine cihê û serbixwe hene ku zayendêwan ên (mê) û (nêr) ji hev cuda dikan.

Herwekî di van bêjeyên jêrîn de:

Mê	Nêr
Mih	Beran
Bizin	Nêrî
Cêlek	Ga
Nehgon	Ciwanega
Mirişk	Dîk

Lê çaxa ew heyber bi awayê jorîn bi bêjeyine serbixwe û cihê ne navkirî ne, hingê bêjeyên (mê) û (nêr) bi ser wan ve datînin û bi vî rengî zayenda wan, yanî mê û nêrê wan didin zanîn.

Di vî awayî de, vegetandek dikewe navbera bêjeya rayî û bêjeyên (mê) û (nêr):

Kewa mî	> Kewê nêr
Kitika mî	> Kitikê nêr
Kera mî	> Kerê nêr
Hirça mî	> Hirçê nêr
Gura mî	> Gurê nêr

Hin caran ev bêjeyên ha; dîl, mak û nêr dikevin pêşîya bêjeya rayî û bi hevre bêjeyeke nû pêk tînin.

Mînek: *Dêlegur (dêl û gur); gura mê.*

*Maker (mak û ker); kera mak (mê).*

*Mékew (kewa mêt).*

*Nêrekew (nêr û kew); kewê nêr.*

*Nêreker (nêr û ker); kerê nêr.*

Heyberên canliber, yên ku mêt û nêriya wan ne li ber cav e, Kurmancan hin mêt û hin jî nêr danîne.

Mînek:

Kurm: Ev canberê biçûk nêr e „*kurmê darê ne ji darê be mirina darê nîne*“. Hemî heyberên biçûk, ji kurmik û kêzikan zayenda wan mêt ye.

Mînek: *Vê kêzikê, wê xalxalokê, wê mozê (sêw) mêske hingiv revand.*

*Mêşa hingiv bi xêr û bêr e. Vê pîrepindê tevnik çinîye. Vê cobirê rehêن giyayî hemî xwarine.*

Mar, ev ajelê xurt zayenda wî nêr e. Lê zayenda bûka-mara „ji sipehîtiya wê bûka mara jê re dibêjin“ mêt ye. Marmarok jî zayenda mêt distîne.

Dupişk, ev heyberê ha jî zayenda wî nêr e. Zayenda seqemar, masî û marmasî jî nêr e.

jî hin mînekan xuya dibe, ku Kurmancan di hin navdêran de zayenda nêr ji xurtîyê wergirtine.

#### MALBATÊN ZAYENDÊ:

Ji vir û pêve, ezê navdêren zimên li ser çend malbat û besan par bikim. Li vir ez dibînim, ku malbatên zayend jî hene, weki çawa malbatêni mirovî hene. Her malbatek, ji serokê malê û hin navdêren mêt û hin jî ên nêr pêktêt.

Bihtirêni malbatan serok nêre. Lê hin caran jî, kebanî serok e. Bi wateyeke dî; seroka malbatê mêt ye. Hin ji van malbatan serok nêre, malbat hemî nêr e an jî mêt ye. Ji bilî malabatan jî hin besen dî jî ên ziman hene zayenda nêr û mêt distînin. Di serî de ezê dest bi malbatan bikim:

##### 1. MALBATA LAŞ (laşê mirov)

Mêt û nêr di laşê mirov de, bi vî rengê jêr ji min re belo

bûye:

a- Her endamek di laş de ku serxwebûnek heye, an jî dikare bilebîte û bi karekî radibe, zayenda wî nêr e.

Mînek: *Dest: Destê wî şikesti ye!*

*Pê (ling): Lingê xwe dirêj ke!*

*Ran: Ranê sitûr.*

*Cav: Çavekî min dixwere.*

*Guh: Guhê min ê çepê hatiye girtin.*

*Dev: Devê çêlekê vekir, da li dinanên wê temâşeke.*

*Poz: Pozê xwe li me bilind kiriye.*

*Ziman: Bi zimanê xwe ê xweş, te em bi xwe re kirin heval.*

*Ser (serî): Serê min dêşê (diêşê).<sup>17</sup>*

b- Endamên ku bi laş ve ne û jê cuda na bin, zayenda wan mî ye.

Mînek: *Pişt: Piştâ min gelek diarihe, jan jê diçê.*

Hin ji nivîskaran hene ku zayenda nêr didine navdêra piştê. Vêce ji bo vê newekheviyê, ezê van malikan ji helbestên kilasîkî, weku belge binivîsim. Feqê teyran dibêje:

*Em dê bi vê niyetê  
Herin piştâ ayetê.*

Mele Ehmedê Batê di mewlûdê de dibêje:

*Bû xezîne ew jî bo durra yetûm  
Daniye puşta wî ew nûra e `zîm<sup>18</sup>  
Hem bi fermana xweda wê sa `etê  
Nûr jî puştê hate nîva cebhetê<sup>19</sup>  
Hem jî puşta wî Qusseyê pak û saf*

<sup>17</sup> Bêvil û disn ji vê bendê derin, zayenda wan mî ye.

<sup>18</sup> Mele Ehmedê Batê, Jêderâ berê r. 17.

<sup>19</sup> Jêderâ berê r. 18.

*Ew emanet hate nik Ebdulmenaf  
Hem ji nik Ebdulmenaf ew muxteff  
Hate puşta Haşim ew nûra sefi<sup>20</sup>*

*Sing: Hingî ez kuxîm, singa min xirxir jê tê.*

*Sing:* Di nav devokan de û di nivîsandinê de jî, hin mî û hin jî nîr bi kartênin. Lî ez dibêjim, sing û pişt wek yekin û herdû jî zayenda mî distînîn.

*Kemax: Ji dirêjkirinê, kemaxa wê kul bûye.*

*Tenîst: Tenîsta min sor bûye; dibe ku ji wê ketinê be.*

*Kabok (ejno): Dema ez ketîm, kaboka min li kevireki ketibû.*

*Gozek: Xara te xindirî, lí gozeka min ket, dilê min ji ber êşîha.*

*Pahnî: Pehnîya min qelişî ye.<sup>21</sup>*

*Dêm: Dêm jî weke rû zayenda nîr standiye û ji vê bendê dere. Di van malikên xwarê de Melayê Cizîrî dibêje:*

„Belku dilber ji rûyê adili yû merhemetê  
Rehmekê kit bi feqîran û bi pirsit gilehê“<sup>22</sup>

Melayê Cizîrî jî dibêje:

„Têk lí dêmê muşterî bûn  
Reqs û govend û sefa ye.“<sup>23</sup>

„Dêmê bi xal  
Ew nûn û dal  
Ismê celal  
Bejna şepafl“<sup>24</sup>

<sup>20</sup> Jêdera berê r. 21.

<sup>21</sup> „Rû“ ji vê bendê dere, zayenda wî nîr e. û ez dibêjim ji ber ku rû ne bi tena xwe ye, û ew dibe bingehêk jî çend endamên din re, ji lewra zayenda nîr standiye.

<sup>22</sup> *Dîwana Melayê Cizîrî*. Jêdera berê, r. 227.

<sup>23</sup> Jêdera berê, r. 179.

<sup>24</sup> Jêdera berê, r. 194.

„Hilalê xatemê husnin li (wê) dêmê bi xal ebrû“  
(wê) li vir divê (wî) be; di guhestina ji tîpêñ Erebî ev şasî  
çêbûye.<sup>25</sup>

Di van mînekan de, em dibînin ku Melayê Cizîrî, dêm  
jî wek rû nêr bikar aniye.  
Ehmedê Xanî jî di van malikêñ xwarê de dibêje:

„Dêma mine erxewanî  
Dêma ku bi nûrê , Beytul-Eqsa  
Qendîlê felek bi wê diîsa“<sup>26</sup>

„Dêma min e sore erxewanî  
Zer bûye wekî we, zaferanî „<sup>27</sup>

Dêm li ser zarê Ehmedê Xanî, zayenda mî distîne.  
Li ser zarê xelkê jî îro ez dibînim ku hin zayenda mî û hin  
jî ya nêr didine dêm.

Dev, diran û ziman, ku her yek ji wan bi karekî radibe  
zayenda wan nêr e.

Tiştên mayîn di dev de, di gerûyê de ta diçe nav singê, û  
paşê jî di hundirê zik de, zayenda hemîyan mî ye, bilî (dil)  
ku bi rehêñ xwe ve zayeda wî nêr e.

Mînek ji wan endaman:

Pidû: Pidûya min sor û sitûr bûye; azar dide hemî devê  
min.

Şikevtik: Şikevtika devê min, wa bizanim şewitiye.  
Şikevtik,bicûkkirîna şikevtê ye û zayenda şikevtê ku mî  
yê sitandiye.

Gerû: Doşavekê vexwe, gerûya xwe pê şilke.

Zengelor: Kêra xwe tûj bike, da bi lez tu zengelora mirîşkê  
bibirî.

Kezeb: Kurê min bes bigirî, te kezeba min reşkir.

Gurçik: Azad gurçika xwe a rastê daye bavê xwe û niha ew

<sup>25</sup> Jêderâ berê, r. 195.

<sup>26</sup> Ehmedê Xanî. Jêderâ berê r. 244.

<sup>27</sup> Jêderâ berê, r. 344.

bi gurçikekê dijî.

Pateres (tihêl):

Keça min, pateresa pezî bixwe! Dibêjin ew gelekî baş e.  
Rovî: Dibêjin: Rovîya stûr û a zirav.

Mîzadank: Kurê min, mîzcîrî bûye, mîzedanka wî dişewite.

Di Kurmancî de, nêrbun nîşana xurtî ye. û eva ha di endamên laş de xuyaye. Herwekî me got, ku di singê de, an di hinav de her tişt mê ye, lê dil bi rehêن xwe ve zayenda nêr sitandiye.

Dil, endamekî serbixwe ye û serkanîya jîndarîya laş e. Ling zayenda nêr sitandiye. Lê pehnî û gozek, ku bi ling ve girêdayîne û bê wî nikarin bi tu karî rabin, zayenda wan mê ye.

Dest, zayenda nêr sitandiye. Lê telî, movik û neynok zayenda wan mê ye.

Kun di laşê mirov de an jî di laşê ajel de, zayenda wan mê ye, bilî dev ku zayenda wî nêr e. û ji van kunan: kuna guh (qula guh), kunka bêvilê (firnika bêvilê), navik kûn (qûn), dawa jinê (zih, gilik).

Mejî zayenda nêr distîne.

## 2. CAN

Zayenda can û rih nêr e.

Rih: gotineke erebî ye.

Ehmedê Xanî dibêje:

„Bîna ve rûha melê Cizîrî  
Pê hey bikira Elî Herîrî“

Li vir em dibînin, ku Ehmedê Xanî, zayenda mê daye gotina rûh. (rûh bi zimanê erebî jî mê ye)

Melayê Cizîrî dibêje:

„Rûh û rewanê min hebîb

*Dîsa bi telbîsa reqîb<sup>28</sup>*

*„Firaqê rûsiya bin te  
Jî min canê şirîn cê da“<sup>29</sup>*

*„Canê xwe me kir daneyê dava ku vedayî  
Ah û sifet ew pê hisiya rahî xeta girt“<sup>30</sup>*

*„Min rihê şêrîn didayê.  
Hudhud er mizgîn bidayê“<sup>31</sup>*

*„Canê melê, rûha melê  
Nûra ji qudret nuqte lê“<sup>32</sup>*

Di van malikên Melayê Cizîrî de, eger can e an jî rih e zayenda nêr sitandiye. Gotina rûh, eger li rex Ehmedê Xanî, û li rex Cizîrî jî be zayenda mê sitandîye. Li vir ez dibêjim, ku (rûh) gelejmar e û ji ber ku, di zimanê erebî de zayenda mê distîne, Ehmedê Xanî û Cizîrî ew mê danîne.. Gotina (rih), beramberî can e, û ji ber vê ye Melayê Cezîrî, zayenda nêr daye (rih).

### 3. DENG

Deng, zayenda nêr distîne. Lê hemî navêng dengan, zayenda mê distînin.

Mînek:

*Terqîna dergehî hat, wa bizanim bavê we hat.  
Cipe-çipa pêyan têt, kifîna marekî dihat.*

*Mîrcîna (mîrçe-mîrça) devê te ye, tu çi dixwî? Xire-xira singa wî ye.*

*Fîşe-fîşa bêvilê ye. Pixe-pixa wî ye, di xew de pixe-pixê dike.*

*Qure-qura zikê te ye, qey te nan ne xwariye?*

<sup>28</sup> *Dîwana Melayê Cizîri*. Jêderâ berê, r. 28.

<sup>29</sup> Jêderâ berê, r. 38.

<sup>30</sup> Jêderâ berê, r. 54.

<sup>31</sup> Jêderâ berê, r. 173.

<sup>32</sup> Jêderâ berê, r. 123.

*Qupe-qupa kurkê ye; mirîşk dema dibe kurk dengekî taybetî heye.*

*Qide-qida mirîşkê ye; ji ser hêkê rabû ye. Kîke-kîka dik e.  
Çîwe-çîwa çîcikê ye. Niçe-nîça dilopan bû, ban dilop dikir.  
Tîqe-tîqa kenê te, ma tu şerm nakî?*

*Nale-nala birîndaran bû, birînên wan dêşan (diêşan).  
Gundiyan şer dikir, vire-vira kevirên wan bû, davêtin hev.  
Ci nûze-nûza te ye, û tu cîma digrî? Ci fîke-fîka te ye tu digrî?*

*Like-lika kenê wê ye, dikene. Pêjna te nayê, ango tu deng nakî, an jî tu xuya nakî. Bêpêjn e, ango bêdeng e.*

*Kaze-kaza vê zarokê ye; giriyê bêdeng.*

*Hîre-hîra hespî ye, dixuye ku ew birçî ye.*

*Ji tirşiyê re dibêjin, piç-piç pêketiye.*

*Ore-ora çêlekê ye. Kûze-kûza seyê me ye.*

*Bare-bara pezî ye. Nirre-nirra şér e. Nirke-nirka berazî ye.*

#### 4. MIROV BI KARÊ XWE NAV DIBE

Mirov bi karê xwe navdibe û ew navdêr jî, zayenda wî mirovî distîne.

Mînek:

*Nivîskarê me ê bi nav û deng, Celadet Bedirxan e.*

*Nivîskara me jî Rewşen Bedirxan e.*

Carekê me got nivîskarê me û carek jî me got nivîskara me.

Carekê nêr û yek jî mê hat.

*Karkera me Helîmê ye. Karkerê me Reşo ye.*

*Şifêrê terekotorê Bengîn e. Şifêra terembêlê jî Zînê ye.*

*Rêberê me Azad e, rêbera me Şêrîn e.*

*Dayik xêrxwaza biçûkên xwe ye.*

*Bav jî xêrxwazê biçûkên xwe ye.*

*Zêrîna min dilovana bavê xwe ye.*

## 5. NEXWESÎ:

Navdêrên bi êş û nexweşîyê ve girêdayî ne, zayenda wan mê ye.

Mînek:

*êşa zirav, di dema bûrî de; êşeke giran bû .  
(êşa telî yê, da ser derdê hewîyê).*

Kuûnêr: *Vê kuûnêrê ez êşandim.*

Nexweşî: *Nexweşîya kurê te sorikin.*

Suhrik û mihkutok, ev herdu nexweşî di zimanê me de Gelejmar (kom) hatine. Dibêjin:

*Nexweşîya kurê min suhrikin.*

*Nexweşîya kurê min mihkutokin.*

Birîn: *Birîna welatê min, di singa Helebçeyê de kûrtir bû.*

Jan: *Jana welatê min, daye dilê min.*

*(Jana telîyê da ser derdê hewîyê)*

Pirzik: *Ew pirzika di rûyê wî de, ne pirzika pîs e?!*

## 6. DERMAN

Derman û hetwan, zayenda wan nêr e, lê hemî navênermanan yên mayîn, zayenda wan mê ye.

Mînek:

Berik: *Vê berikê bixwe! Ev berika serêşê ye.*

Şirûb: *Vê şirûbê (doşavê) vexwe, da tu bes bikuxî.*

Toz: *Vê tozê bi ser birîna xwe werke, da zû ziwa bibe.*

## NÊRÛBEND:

*Vê nêrûbendê bi pişta xwe ve bike, da êşa wê sist bike.*

Qetra: *Ka wê qetrayê bide min, çavên min diêşin.*

Hemî ew dermanen, ku jin, ji bo sipehîbûna xwe bi kar têne, zayenda wan mê ye.

Li vir ez dibêjim, ku ew navênerman, her yek vedigere ser bingehê xwe.

Ji ber ku toz, ya ku derman e, di bingehê xwe de, ew

toza ku ji axê derdikeve, û zayenda wê mî ye..  
Berik jî weha ye, ku li berika tovê giya diçê û kurmancan  
zayenda mî pê dane.

## 7. ÇAPEMENÎ:

Cî navdêrên, ku bi çapemenî û nivîsandinê ve girêdayî  
ne, zayenda wan mî ye.

Mînek: *Çapa yekê, a dîwana Osman Sebrî li sala 1998 ê*  
*derçûye.*

Xwendin: *Xwendina zimanê kurdî bi min gelekî asan e.*

Nivîsandin: *Nivîsandina helbestan bi min, ne asan e.*

Tîp: *Tîpa pêşî ji sernavan, bi gîrsî tê nivîsandin.*

Birk: *Birka yekê ji destpêka vê cîrokê bixwêne.*

Riste: *Rista (hevok) dudoyê binivîse!*

*Hevoka dudoyê bixwêne!*

Komek jî zayenda mî distîne.

Gotin: *Gotina welat bi min şêrîn e.*

Cîrok: *Cîroka Mem û Zînê.*

Bîhnok (farîze), xal (nuqte), zayenda wan mî ye.

Pêwistîyên bi xwendin û nivîsandinê ve girêdayî ne,  
zayenda wan jî mî ye.

Mînek: *Deftera min, pertoka te, pînûsa birayê min.*

## 8. RENG

Bêjeya reng û hemî navên rengan, zayenda wan nîr e.

Mînek: *Rengê sor ji bo zarokan baş e.*

*Min leyistikeke sorê hinarî, ji bo bîçûkê xwe kiriye.*

*Dilê min, di kirasekî şînê asmanî de heye.*

*Reşê tarî, dilê mîrovân teng dike.*

*Rûyê wê, wekû kulîlikeke pembehîyê vekirî, ges  
dibû.*

*Meng, boyax û debax, zayenda wan jî mî ye.*

*Menga kirâsê şîn li cilan vedaye; cil hemî şîn bûne.*

*Boyaxa pêlavâ min reş e.*

*Meskî debaxa xwe ne girtiye.*

*Ji debaxa bacanêñ reş, destêñ min reş bûne.*

## 9. ERD

Di hin zaravan de zayenda navdêra erdê nêr e û di hinên din de mê ye.

Ehmedê xanî dibêje:

„Nahîdi bi erdê da dida çeng  
Meh çû veşirî di bircê xerceng.“<sup>33</sup>

Di vê malika Ehmedê Xanî de, zayenda erdê mê ye.

Melayê Cizîrî dibêje:

„Me hadir sucdeya sukrê li wî erdê muqedes bir  
Bi mujganên xwe dur suftin enî malî li erdê da“

Li vir mirov dibîne, ku Melayê Cizîrî, carek zayenda nêr û carekê jî zayenda mê daye navdêra erdê.

Celadet Bedirxan di kovara Hewarê de, û di gotara bi navê Rewşa dinyayê, dema li ser şerê Lîbyayê diaxive, dibêje: *Serê Lîbyayê an Misrê ji 15 îlona sala 1940 ì de dest pê kiriye. Hingê talyanan dirêjî Misrê kir û Orduwa Merêşal Greçyanî, di erdê Misrê de gihişte...*

*Dîsan par li 9ê kanûna pêşî Ingilîzan dirêjî talyana kir; ew ji erdê Misrê derêxistin û ajotin heta Bengaziyê. Lê paşê Eleman derbasî Efriqayê bûn û li 3ê Nîsana sala 1941 ê Ingilîz ji erdê talyanan derêxistin.*<sup>34</sup>

Li vir, em dibînin, ku Celadet Bedirxan zayenda nêr daye navê erdê. û di van mînekên Celadetî de, zayenda erdê nêr e, ji ber ku erd di van mînekan de hatiye parçekirin û xweserê hinan e.

Em binêrin, ka Nûredîn Zaza ci dibêje? Di gotarekê de ya ku bi navê ((perîşanî)) di Hewarê de nivîsiye:

...Cendirme tivinga xwe... dirêjî şivan dike...û berdide.  
Şivan bê deng dikeve erdê û pez belav dibin. ...Pîrekan,

<sup>33</sup> Ehmedê Xanî. Jêdera berê, r. 212.

<sup>34</sup> Celadet Bedirxan, Kovara Hawarê. Weşanên Nûdem. Stockholm 1998. Rupel 896.

*zaroyên xwe, ên ser şîr avêtine erdê.<sup>35</sup>*

Li vir, em dibînin, ku Nûredîn Zaza zayenda mî daye  
(erd)ê, ji ber ku erd li vir têvel e, divê mî be.

Kurmanç bi vî rengê xwarê dibêjin:

*Wê merşê li ser erdê raxe.*

*Barê ketî li erdê namîne.*

*Vê erdê bîmale.*

Di van hevokan de, (erd) zayenda mî distîne. Lî dema ez li ser parçeyek erd biaxivim; bi vî rengê xwarê tê gotin:

*Erdekî me li nêzîk xwendegeha Selahedînê Eyûbî heye.*

*Memo çûye nav erdê xwe. Erdê me nehilkiriye. Divê em wî erdî zûzû bicênin.*

Di van hevokan de, erd zayenda nîr distîne.

Ez dibêjim ku erd bi rengê tevayî û ne di bin navê kesî de be, zayenda mî distîne. Dema em dibêjin: Bar kete ser erdê; ev erd,erdeke giştî û bê sînordane; hingê zayenda mî distîne. Lî dema min got erdê min ev erd parçeyek ji wê erda mezin e; erd parce dibe û parce jî tim nîr e.

Her tişt li ser zevî (ji xweristê), dema ji erdê bilind bû nîr e. û dema di erdê de kûr bû „bi destê mirov, an bi ci hoyek be“ zayenda mî distîne.

#### a) NAVÊN NÊR:

Ji zuxirî kubicûktirîn tişt e û ta digehê kopê çiyê, Kurmancan ew bi zayenda nîr dane naskirin. Ango tiştta bi ser axê ket û bilind bû, zayenda nîr distîne.

Mînek: Wî zuxurî, wî kevirî, vî kêtstekê axê, wî girî, wî çiyayî, li serê wî kopî...

#### b) NAVÊN MÊ:

Dibêjin: *Wê axê, axa sipî, axa sor, zayenda axê mî ye. Zîvistanek sar e, mar ji kuna xwe dernakeve. Kun jî mî ye.*

*Korta avê, gola avê, coya avê ji ser pembûyî bigire. çala*

<sup>35</sup> Jêdera berê rupel 851.

*genim û çala avê jî hebû. Havîneke ziwa ye, av di bîra me de nemaye. Şikevta me mezin e, kerîyek pez diçê nava wê.*

Tîsta di erdê de cû xwar û kûr bû, ew mê ye.

çem ji vê bendê dere, ango zayenda wî nêr e. û ez dibêjim, ji ber ku, çem ne bi destê mirov hatiye kolan, zayenda wî nêr hatiye. Her tiştê bi destê mirov an bi hoyek hatiye kolan, zayenda wî mîye.

## 10. AX Û LÊCÛNA WÊ

Ax mê ye û hemî ew tiştên ku di hûrbûna xwe de li axê diçin, zayenda wan mê ye.

Mînek: *Vê axê, axa sipî û a sor. Vê nikorê. Nikora daran. Vê xwelîyê.*

*Vê sêlakê, hinek ji sêlaka ser devê çem bîne, da em nokên xwe pê sorkin.*

*Bi vê kilsê em ê dîwarên xwe sipî bikin. Vê cesê.*

*Vê xwêyê. Vê cimentoyê...*

## 11. XANÎ

Zayenda xanî nêr e, lê cihêن rûniştinê, zayenda wan mê ye.

Mînek:

Mal: *Mala me mezin e, tê de tijî mîr û jin e.*

Ode: *Oda rûniştinê û a xwendinê.*

Kepir: *Kepra me di nav rez de ye.*

Kolik: *Kolika me. ya ku di nav werzî de ye, siha wê gelek xwes e.*

Kox: *Koxa dewêr, çêlekên me têde ne.*

Gov: *Gova pez di nav şikevtan de ye.*

Koz: *Me koza kar û berxan, di hewşê de avakiriye.*

Kozik: *Kozika mirîşkên me biçûk e.*

Kon, Jor û axur, ji vê bendê derin, zayenda wan nêr e.

Xanî: Ev navdêr zayenda wî nêr e. û hemî ew perçen se-rekî, yên ku xanî li ser wan ava bûye, zayenda wan jî nêr e.

Mînek: *Dîwarê xanî, serê xanî, banê xanî, binê xanî,*

*dergehê xanî, devê (derê) xanî.*

Parçen biçûk yên ku di laşê xanî de ne, zayenda wan mî ye.

Mînek: *Kunca xanî, serdora xanî, şirika xanî, çasera xanî, anîşka xanî, pêpînka xanî, derîzana xanî, kuleka xanî* û *pencereya xanî.*

Caser „Car û ser“: Navekî dumil e (hevedudan), û navê dudoyê, ku ser e jî nîr e; lê ji ber ku, çaser navê cihek belo dike, em dibînin ku zayenda mî standi ye.

Caser: *Serdora banê xanî ye; mîr û jinêñ gund, li çasera xanîyê me civat girtine; li çasera xanî beroje û tava wê germe.* Bi wateya ku di bin sefendê de civat girtine.

12. Cih, war, gund, bajar û welat, zayenda van navan nîr e. Lê çaxa cih, gund, bajar û welat bi nav bûn, zayenda wan mî ye.

Cih: Dema bê nav e, zayenda wî nîr e, lê ku me navek lê kir û te got, bêder (bênder), ew cih bi navê xwe hate naskirin, û wê çaxê bêder zayenda mî distîne.

*Bêdera nîskan, bêndera genim û a ceh...*

Gund jî cihekî bê nav e û nenaskirî ye, zayenda wî nîr e, lê dema ku me ji wî gundî re, Sermisax got; wê çaxê zayenda Sermisaxê mî ye.

Sermisaxa banî û a xwarê jî heye. Bajar, zayenda wî nîr e. Lê eger bajarê me Dêrik be, zayenda Dêrikê mî ye, Dêrika kevn û a nû. Ezê biçim bajarê Dêrikê. Ezê biçim Dêrika çiyayê Mazî.

Welat: Zayenda nîr distîne. Lê eger me welitek, bi nav kir, wê çaxê zayenda mî distîne. *Kurdistana me bindest e.* Bi vî rengî, balafirgeh, firoşgeh, çayxane, qatabxane, dibistan. Hêlîn, kozik, zayenda wan mî ye.

Naverast: Zayenda mî distîne. Lê bergeh, zayenda nîr distîne. Li vir ez dibêjim, ev gotin ji du gotinan pêk hatiye (ber û geh), geh û ber (rû). wek, em bibêjin, berê cihekî, an jî rûyê cihekî, cih wek xwe maye û bi nav ne bûye; ji ber ku bergeh nenaskirî ye. Vêce ez dibêjim, eger paşgira (geh) bi navdêrekê ve bû û navê cihek da naskirin, hingê navê

cihe û zayenda mî distîne. Lî eger navê cihek neda naskirin, zayenda wî navê ku heye, distîne.

Naverast: Ew jî ji du gotinan pêk hatiye (nav û rast), ev herdu gotin di zimanê Kurmancî de, bi wateya erdek pan û rast hatine.

Nav: Zayenda mî distîne; nava xanî, nava bênderê, nava mirov. Hinavê mirov, zayenda nîr distîne.

Rast: Ji xwe erda rast e, û ev jî bi wateya erdek rast e. Ji ber ku, erd dema têvel be zayenda mî distîne, ji lewra naverast jî, gereke zayenda mî bistîne.

Mînek: *Em herin li wê rasta ha rûnin.* (Eva ha li gundan hebû).

*Li rasta pişt Mizgevtê, xortên gund bi xar û kaban dileyizin.*

*Em herin wê nava ha, li ser giyayî rûnin.*

Her navek ji van, ji hev cihê bi kar têñ, û herdu nav di gotinekê de jî bi kar têñ.

Wek: *Naverasta pêsyâ dibistanê, ji bo leyistika gokê mezin hîstine.*

Navdêra „paytext“, hin kes nîr û hin jî mî dibêjin, lê ez bi vî rengî şirove dikim:

Eger me got ku paytext navê cihe, divê zayenda mî bistîne. Lî eger me got, ku navdêra paytext ji du navan pêktê (pa û text) û text navê dudoyê ye û nîr e; divê paytext jî zayenda nîr bistîne.

### 13. ÇIYA, BAN Û NEWAL

Çiya bi xwe zayenda nîr distîne. *çiyayê „Araratê“*. *Çiyayê „Cûdî“*: çiya ku bi nav dibe; hin çiya li gel navê xwe dimînîn û nav bi tenê tê gotin. Hin ji van çiyayan ew navê ku lê kirine, zayenda nîr distîne, wek: „Cûdî“, ... Ji çiyayê „Cûdî“ re dibêjin: „Cûdiyê mirada.“

Navê „Cûdî“, zayenda nîr distîne.

Lî navê hin ji çiyayê dî, zayenda mî distînin.

„Singal“, navê çiyayekî ye û zayenda mî distîne; em dibêjin, ezê herim *Singalê*. *Ez li Singalê çêbûme.*

*çiyayê „Bagokê“ di ser bajarê Qamişloyê re ye.*

Ez gihame Bagokê. Şingal û Bagok zayenda mî distînin. Ez dibêjim, dema ku nav li çiya dîkin; li gora wê navdêra ku, li wî çiyayî kirine; eger ew navdêr, mî be, zayenda çiyayî mî dimîne, lê eger ew navdêr gotineke nîr be, zayenda çiyayî nîr distîne; ne wek navê cih, bajar û gundan ku hertim, zayenda mî distîne.

Eger em li navê Bagok binêrin; ji du navan pêk hatiye (ba û gok) û li gor benda dumilî. zayenda navê didoyê distîne, ku li vir navê didoyê gok e û gok jî zayenda mî distîne.

Best û Newal Zayenda wan mî ye, ji ber ku best an newal, erdek mezin e û ji bo çandinî bi kar tînin. û her û her medreb û avî ne, ji ber vê jî, divê ew mî bin.

Erda şinatî, ya ku tê avdan, zayenda mî distîne. Newal bi xwe ji du gotinan pêkhatiye ((ne û wal)) wal bilindahi ye, newal jî nivzî ye.

Ban: Naverasteke di bilindahîya çiyê de ye, û ji bo çandinîyê bikar tînin, ev nav jî lê kirine; wek bibêjin *banê wî erdê çiyê ye*. û zayenda wî nîrê; ji ber ku ban di kurdmancî de zayenda nîr distîne.

Lê gelî kûr e û kûrahîya gelî xweristî ye, wekû a çem, ango ne kolaneke xwedest e. Li vir em dibînin ku ev herdu nav (çem û gelî) zayenda wan nîr hatiye.

Belt: Belta mezin, milek ji çiyê weha nivz hatiye û bergehek fereh e ji bo çandinîyê bi kar tînin. û ez dibêjim, ew belt li gel ku; parçek ji çiyê ye û navek lê bûye, ji lewra zayenda wê mî hatiye.

Belteke biçûk jî heye; ku ew parçek biçûk ji laşê çiyê ye, bi dîwarekî çiyê ve bel bûye. Tilûr hêlinê xwe li ser çêdikin. Ev parçeyê biçûk ji laşê çiyê ye, wekû çawa gozek ji laşê mirov cuda nabe, ew jî weha ye. û dibe ku ji ber vê jî ew mî hatibe; herwekî berê jî, me şirûve kiribû.

Bavê min Emerê Evdile, ji refikan re digot: Beltik, û ji çekmeçê re jî, qolîtik, û zayenda wan jî mî digot. Cihê cirayê, ku ji herîyê çêdikirin, ew jî beltik e.

Li vir tê bîra mirov, ku çawa mirovê kurd, zimanê xwe pêş xistiye. Bê guman mirovekî nexwendevan jî bûye, ewê ku belta li dîwarê çiyê guhestiye dîwarê xanî û navê wê beltika çirayê danî ye.

Vêca beltika çirayê jî wek a çiyê, zayenda wê mîye. Pêpelûk, di singa çiyê de û bi destê mirov çêbûne. da mirov bikare pêve hilkişe banî. Wekû rîyekê û ji çesnê erdê dûr neketiye, lê navek li cihekî bûye, ji lewra zayenda wê jî mî hatiye.

Xurim: Ev navdêra ha jî, zayenda mî distîne.

Xurim: Di dîwarê çiyê de mîna kortikan ji cihê pê re dikolan, ji bo ku, bi çiyê ve hilkişin jora beltê; Ji ber ku, gelek caran tilûran hêlînîn xwe li ser belta biçûk çêdikirin. Vêce sîpe û xort diçûn çêlîyên tilûran ji hêlînan digirtin. Di dîwarê bîran de jî, xurim çêdikirin. Xurim, ango kortik.

Pêpink (derîzan): Ji ber ku parcekî biçûk ji erdê ye, û di çesnê xwe de her erd maye, lê navek li cihekî kirine, ji bo vê jî, zayenda wê mî hatiye.

Teht: Zayedâ tehtê jî mî ye, ji ber ku; teht parcek ji laşê çiyê ye û ne serbixwe ye, an jî hin caran tehtek heye ji rûyê erdê bel na be. Teht ji laşê çiyê ye, wek çawa pehnî di ling de ye. û ji ber vê jî; ew mî hatiye.

Rê, Rêcîk û Şivîle: Zayenda wan mî ye, ji ber ku ji rengê xwe yê xweristî kuerde dûr ne ketine; belê cihin bi nav kirine, ji lewra zayenda rê, rêcîk û şivîlan û herweha cade jî mî sitandine.

Xîşik û xêz jî, zayenda wan mî ye.

14. Çarrex: Zayenda çarrexan nîr e.

Mînek: Rojavayê Kurdistanê. Rojhilatê bajêr. Başûr Kurdistanê. Bakurê welat.

Li gel ku, her navderek ji van, ji du navdêran pêk jî hati ye, li gor benda navdêra dudojê, zayenda xwe na sitîne.

Wî aliyê çem. vî rexê çem. Rast û çep jî, zayenda nîr distînin.

Rastê min û çepê te. Kenar jî, zayenda nîr distîne.

Rexê çem, kenarê çem, zayenda nêr distînin. Lê eger me got lêva çem, zayenda mêt distîne; ji ber ku, lêv mêt ye; û me rexê çem weku lêva çem bi kar aniye, divê ew mêt be.

Lê dema em dibêjin Rojhelata Navîn, zayenda mêt distîne: ji ber ku, Rojhelata Navîn, navê cihek belo dike. Pêşî, paşî, tenişt, nav (navend), navik, dorik, dor, zayenda mêt distînin. *Pêşîya xanî. Paşîya xanî. Teniştâ min. Nava malê. Navika zarokê kulbûye. Dorika legenê şikesti ye. Li dora malê dileyizin.*

Parî û Parçe: Hin zayendê wan mêt û hin jî nêr bi kartênin. Lê ez dibêjim gereke parça nêr be. û parî jî eger weku parçeyek me got, divê zayenda nêr bistîne, parîyê xwe biçûk bike. Lê eger wateyek têvel sitand, gereke mêt be. pariya nanê me ne maye.

Em dibînin, ku di vê hevoka dawiyê de, parî mêt hatiye; ev hevok jî, min bi sedên caran, ji diya xwe û kebanîyên dî bihîstiye.

## 15. CIHÊN ÇANDINIYÊ:

Cihêن çandinîyê, ên şînatî „şînî“ û mêtwe tê de dicînin û bi navkirî ne, du beşin:

a. Rez û Werz: Di rastî de ew bej (dêm) têne çandin, ango nayêne avdan, û li ser rewa erdê şîn dîbin, zayenda wan nêr hatiye.

*Rezê me şîn bûye û mêtwên rez weşî (goşî) jî girtin e.*

*Werzê me baş e; berhema şebeş û gundoran bi xêr û bêr e.*

b. Beşê Avî: Ev beş, di havînê de gerekî avdanê dibe, zayenda mêt distîne.

Mînek:

Midreb: Midreba birinc, ya ku tim av li ser wê ye.

Avî (avîk): Parça zevîyeke biçûk e, şînî ji mala xwe re tê de dicînin. û ji navê wê xuyaye, ku avî ye, ango tê avdan.

Benik: Ew jî parça erdekî biçûk e, û avî ye.

Benika bacana. *Me benikek erd heye, emê kuncîyan tê de biçînin.*

Di wextekê de, gundîyan bi benekî pîvanê zevî dabeş dikirin. Vêce benik jî ji wê hatiye, ku ew bi qasî wî benê pîvana gund bûye.

Midreb: Zevîyeke fereh e û avî ye. Medreba birinc û a pembû.

Hin caran di medreba gundî de, eger a birinc ba, an jî a pembû ba, di nav de jî avîkên şînî ên bacan, bamî, îsotan... hebûn.

Dehl û Daristan: Dehl û daristan jî, zayenda wan mî ye.

## 16. DAR Ü BEŞÊN WÊ

Dar: Zayenda darê mî ye (dara heşîn). Lê beşen xurtî darê, zayenda wan nîr e.

WEK: Rayê darê, qurmê darê, çiqilê darê.

Lê pelên darê û navdêra berê wê, zayenda wan mî ye.

Mînek: *Dara mîwê hêvşîha ye, ango ber ne girtiye. Dar mî ye.*

*Ew rayê darê ye, di wê erdê re bel bûye. Qurmê darê çiqas sitûr bûye.*

çiqilekî şîn, an yekî hişk. Ra, qurm, çiqil, zayenda nîr distînin.

Pela mîwê û pela tuyê. Sêva kurmî. Pel û sêv zayenda mî distînin. Lê ber, berê mîwe û ê şînî, zayenda nîr distîne.

Dara heşîn bi reh, qurm û çiqilên xwe ve xurt e. Ne ba, baran û badev, pê nikarin. Lê ber û pelên wê lawaz in, bi hêza ba û baranê dikevin.

Li vir careke dî tê bîra mirov, ku nîrîti di gelek babetan de ji xurtiyê hatiye. Ew beşen di laşê darê de, ku lawazin, zayenda wan mî hatiye.

## 17. MALBATA GIYA

Giya jî malbatek heye, û giya bi xwe serokê wê malbatê ye, zayenda giyê nîr e. Lê giyagelaşen ku mirov an ajel wan dixwin, zayenda wan mî hatiye.

Mînek: *Vê tûzikê, vê pûngê, vê sebanixê, vê reşadê.*

*Min epraxêن tirşokê pêçane, ez gelek ji epraxêن  
xerdelê jî hez dikim.*

*Golikê, ew firîza şîn hemî xwariye.*

*Mêşa hingiv, xuşîlê dixwe, ji bo hingivî çêke.*

*Xuşîla şîn xwarina mîşa hingiv e.*

Qeram: Ev giyayê ha bê ber e, jipê rawestayî, û pir xurt e, ne mirov û ne ajel vî giyayî naxun, zayenda wî nêr e.

### 18. BERÊ ŞÎNÎ „şînatî“

a. Şînîyê ku bi leman ve ye, û lem jî li ser zevî dirêjkiri ye, zayenda wan nêr e. Wek:

Xiyar, şebeş, gundor, fincik, kulind, girêtî.

Li vir ez dibêjim, ku ev berê şînî, ji ber ku serdestî lemê (pinê) xwe ye, ji lewra zayenda wan nêr hatiye.

Em dibînin, eger lem hişk jî dibe, şebeş demeke dirêj dimîne û tête xwarin. Şimamok û petrişok ji vê bendê derin, zayenda wan mê ye; ji ber ku, şimamok an jî petrişok lawazin.

b. Şînîyê ku bi pin ve ye û pin bi xwe li pê sekinî ye.

Wek: Bacana sor, bacana reş û îsot.

Ji ber ku, pin serdestî berê xwe ye; eger hat û çiqilek ji pinî şikest, û bacanek bi wî çiqılı ve bû, ew bacan sax na mîne; xira dibe.

Li vir em dibînin, ku liba bacanê, bê dara xwe namîne, ango lawaz e. û ji ber vê, ez dibêjim, ku bacana sor, a reş û îsot, zayenda wan mê hati ye.

c. Şînîyê ku serî ye û bi rayê xwe ve çêdibe; ra, an jî qurm bi xwe bûye serî û di bin axê de ye, zayenda wan mê ye.

Wek: Sîr, pîvaz, petate, tivir, binerdik (tîto), silk gêzer.

Sîra te da min tûj bû. wê pîvazê hûr bike.

### 19. MALBATA GUL Û KULÎLKAN:

Bi hemî core û texlîten xwe ve, zayenda wan mê ye. Vê gulê, wê kulîlikê. Wê sosinê, wê binefşê, wê nêrgizê, wê hîroyê. Kulîlika bilbizêkê sipehi ye.

## 20. SITIRÎ Û QUNCIR

Malbata stirî qunciran, zayenda nêr distîne. Dar ku heşîn e, zayenda mêt distîne. Lê ku hişk bû, zayenda nêr distîne. Sitirî, quncir, dirik, kelem, pîj, kelempêr, ango çi pîjik û darikên ku hişkin, zayenda wan nêr e.

## 21. MALBATA ZAD (dexil)

Ceh, genim, birinc, garis, zayenda wan nêr e, şîn be, an jî hişk be. Genimê şîn, genimê hişk, cehê şîn, cehê hişk, garisê me heşîn e, birincê hişk, birincê heşîn (şîn). Nok, nîsk şoqil, û baqil... tuxmê ku berê wî diqalikê de ye, ew bi kom tê, ango nêr û mêt nîne. Nîskên me, şoqilên me gelek in. Ezê baqilan bikelînim.

Lê eger me libek jê got, hingê zayenda mêt distîne. Liba vê nîskê gir e. Liba vê nokê hûr e, herweha liba genim û cehî jî her mêt ye. Dexil mêt ye. Dexla me gelek baş e.

## 22. GENIM:

Genim nêr e û hemî ew tiştên, ku jê çêdibin, zayenda wan jî nêr e.

Genim, dan, hûrik, savar; ji genimî dan, savar û hûrik çêdibin.

Genim, ard, hevîr, nan; ji genimî, ard, hevîr û nan çêdibin.

Wî genimî, wî danî. Hûrikê dan û yê savar, têkel hev dîkin û kutilkan jê çêdikin.

*Savarê me di aşî (êş) de ye.*

*Ardê me hûr hatiye hêran.*

*Ezê hevîrê xwe bistîrhim.*

*Nanê xwe ezê li tenûrê bipêjim.*

*Te nanê xwe pehtiye?*

## 23. QAŞIL, NAVIK Û DENDIK: zayenda wan mêt ye.

Mînek: *Qaşila dendikê, qaşûla şebeş, qaşila gundor, qaşila*

*kulind. Navika şebeş, navika dendikê.*  
Kakil jî weku navikê, zayenda mî distîne.  
*Kakila gozê, kakila behîvê.*  
Qalik û qaqilk jî, weke qaşilê zayenda mî sitandine.  
Mînek: *Qaqilka hêkê, qalika berûyê „berû ji qalikê derket,*  
got:  
*Devî çende!*  
Kalanê mar, weku kirâs, zayenda nîr sitandiye.

#### 24. NAVÊN XWARINAN:

Xwarin bi xwe navdêrek e û zayenda mî distîne.  
Xwarinê kelandî, zayenda mî distînin. Lê dema ku ew  
zad xavin, zayenda wan nîr e.  
Wek: *Wî savarî (xav), wê savare (kelandî).*  
*Wî birincî (xav), wê birincê (kelandî)*  
*Wî danî „dema ku xave“*  
*Wê danûkê „dema kelandi ye“*  
Genimê kutayî, genim li vir nîr e. Lê meyîra, ku ji wî  
genimî çêdibe, zayenda mî distîne.  
Vê nîskê, vê tirşikê...Xwarinê ji şînî çêdibin, hemî  
zayenda mî distînin.  
Goşt, ji vê bendê der e, bi xavî û kelandî, zayenda nîr  
distîne.

25. BÊJEYÊN SIPÎ: Ji şîr, mast, run, penîr...re sipî dibêjin.  
Sipiyê pez û dewaran, û berhevên wan, zayenda nîr  
distînin.

Mînek: *Wî şîrî, wî mastî, penîrê mîşin, rûnê çêlekekê,*  
*nîvişkê mîhan. Şûrtanê (keşk) me şor e. Vî firşikî.*

a) Firşik: Şîrê ter di zikê sexelê de ye, di zikê makê de.  
Vêce dema pezekê, cêwî bi anîya, yek ji wan sexelên cêwî  
serjêdikirin, û ew firşik ji zikê wê derdixistin; kîsikek  
çermî bû, hişk dikirin, û hinek ji wî şîrî di nav şîrê nûduhtî  
de dibişavtin, û paşê ew dinixumandin. Û bi vî rengî penîr  
çêdikirin.

b) Firşik: Şîrê terî pez an çêleka nûzayî ye. Kurmancî dibêjin, gereke sexela nûzayî firşik bibe, ango şîrê terî maka xwe bixwe, da xurt bibe.

Lorik ji vê bendê der e, zayenda wê mê ye. Lorik, ew şîrê ter yê ku li çend rojên pêşî didoşin dema germ dikin, diqete û dibe wek penîr; xwe bi heve nagire.

## 26. QAFÊN MALÊ

Qafêن ku di nav malê de û ji bo xwarinê bi kartênin, zayenda wan mê ye.

Mînek: *Vê zerikê* (piyanê), *vê lalîyê*, *vê beroşê*, *vê çaydanê*, *wê şûşê*, *wê qedeħê*, *wê legenê*, *wê binqedehê*, *vê palankê* (safokê).

Parzûn: Ew jî palanke, zayenda nêr disitane, lê ez dibêjim, gereke ew jî mê be. Ji ber ku parzûn ji du gotinan pêkhatiye ((par û zûn)); zûn bi wateya girtin hatiye, ango makder e, divê mê be.

Kevçî ji vê bendê der e, zayenda kevcî nêr e.

Firaxa ku zadê xwarinê dikeve tê de (firaxa kevin), zayenda wê mê ye, wek: vê kuwarê, vê îsirê, vê hebanê, vê meşkê.

Firaxa av dikeviyê (kevn û nû) zayenda wan nêr e, wek: *Cêrê avê*, *kunê avê*, *cewdikê avê*, *mîsînê avê*, *selahiyê avê*. Kevçi, zayenda wî nêr e. Kevçî di rengê xwe ê pêşî de, çaxa mirovê Kurd bikar aniye, dar bûye; darekî panî şahîk bûye, û ji ber ku, darê hişk nêr e, ji lewre kevcî jî, nêr hatiye.

## 27. HÊSINCAW:

Tefşo û hêsincawên wek tefşo, zayenda wan nêr e, wek, çakûç, qazme.

Tefşo: Di bingehê xwe de, ji kevirî dirust bûye; jê re di gotin tefş. Tefş jî parce kevirekî pankirî bû, pê zevî dikolan û ajel û dehbe jî pê dikuştin, nemaze li nêçîrê. Ew tefşê kevirî, li paşê bû bi tefşo. Tefş, ji rengê xwe ê pêşî dûr ne

ket, kevir bû tefş (parçe), û li dawî tefş bû tefşo. Û ji ber vê jî tefşo, zayenda kevir ku nêr e sitand.

Bêr: Zayenda wê mê ye.

Ez dibêjim ku bêr ji gotina birin hatiye, ango dikare komikek ax hilgire û ji cihê wê biguhêze. Birin (navê kar), zayenda mê distîne; ne dûre ji vê hatibe, ku zayenda wê mê hatiye.

## 28. ALAVÊN HÊRTINÊ:

Alavên ji bo hêrtina zad, zayenda wan nêr e, wek: Aş, destar, girik, mihkut, cîrn (cuhnî). Destar û cîrn, ev herdu alav ji rengê xwe ê kevirî dûr ne ketine, û ji ber ku kevir, zayenda wî nêre; ewêñ dî jî nêr hatine.

Aş jî her li ser rîbaza destarî bûye. Du fer destar li ser hev bûn û ji wan re feraş digotin, ew jî her ji kevir bûne; di bingeh de jî fereşe, ango ev (kevir) yekî pan û fere.

Girik jî wek destar e, lê ew ji herîyê dirust dikin, û ta hişk dibe, ew ji rengê xwe ê bingehî dûr ketiye, û zayenda wî wek a destarî nêr hatiye.

Girik, ji bo sipîkirina çiltûkî ye; çeltûk bi qaşil (tûk)a xwe ve ye, vêce li girikî dihêrin, ji ber ku girik sivike, nahêle ku birinc bête hêrtin, belê sipî dibe.

Mihkut: ji dar dirust bûye, ji ber ku ew jî parçek ji darê hişk e, û darê hişk, zayenda wî nêr e, em dibînin mihkut jî zayenda wî nêr hatiye.

Moxil, bêjink û serad, ew jî zayenda wan mê ye.

## 29. HALETÊ KEVIN:

Halet û li gel hemî parçen, ku pêre ne, zayenda wan nêre, wek: Wî haletî, wî nîrî, wî şûrikî, vî gêsinî. û ev parçeyên halet hemî ji dar pêk hatine, û gêsin jî, ji hêsin saz bûye, dar û hasin zayenda wan nêr e, ji lewra halet û bi beşen xwe ve, zayenda wan nêr hatiye. Ji ber ku, çêkirina wan ji rengê dar dûr ne ketiye.

### 30. RAXISTINA MALÊ:

Hemî ew tiştên, ku di malê de têr raxistin, zayenda wan mêmey.

Mînek: *Wê raxekê (merşê), wê teyîjê, wê mafûrê, vê cilika nimêjê, wê hesîrê, vê nivînê, vê doşekê, wê nivînokê, wê doşekokê, wê bendikê.*

*Bendik li ser zarokê re di binê dergûşê re dibin û pê zarokê di dergûşê de girêdidin.*

Kulav, ji vê bendê der e, zayenda kulav nê re. û li vir, ez dibêjim, ku cara pêşî mirov, kulav li ber xwe kiriye, û paşê di malê de raxistiye, vêce kulav jî wek sakoyek, ebayek, ji bo laşê xwe ji germ û sermayê bi parêze, û wek em dibînin cilên li berkîrinê hemî, zayenda wan nêr e; vêce ez dibêjim, dema em li zayenda kulav binêrin gereke em wî, ji beşê cil û berk bihejmêrin.

Balgeh, zayenda nêr distîne. Navdêra balgeh di bingehê xwe de ji du gotinan pêkhatiye; (pal û guh), û ji ber ku di kurmancîyê de ji bo gotina dumil, zayenda navê didoyê distîne; ji ber ku navdêra guh jî zayenda wî nêre; balgeh (palguh) jî zayenda nêr standiye.

### 31. MÛ Û PIRC

Mû, zayenda nêr distîne. Lê hemî corêr pirçê ku hene, zayenda wan mêmey.

Mînek: *wê porê, wê pirçê, wê kejê, vê hirîyê, vê livayê, vê pûrtê. Hirîya mihê ezê bikim balgeh. Laşê wê keçikê bi pirçê; lê pirça wê zer e.*

*Lîva berxê me hûr e, bi kîr nivînê nayê.*

Pûrta seg, pûrta devehê, a kitikê, û pirça kitikê jî dibêjin. Keja hin bizinan zer e. mirovê kej ew e, ku pirça wî zer e.

Lê mirovê boz, pirç û pora wî bi ser sipî ve diçe „zarok, xort“.

## 32. TEVN Û RÎS

Tevin bi xwe, zayenda mî distîne, lê hemî endamên (navdêrên) di malbata wê de, zayenda nîr distînin.

Mînek: *Mû, rîs, ben, dezî, ta, û tiştên, li ser tevnê çêdibin, wek: celte, tûrik, ceher, gûnî, ciwal, kîs, lûfik, zayenda wan nîr e.*

An jî bi rengekî dî, em dikarin bêjin, ew pêwistîyên, ku bi tevnê hatine çinîn, û yekcem in, zayenda wan nîr e. Têr û xurcezîn, ku ji du ceman pêk têr, zayenda wan mî ye.

Cem bi xwe, zayenda wê mî ye.

## 33. BAR Û PIŞTÎ:

Bar û piştî, zayenda wan nîr e.

*Barê mehîna min genime. Lê barê hespê te xwê ye.*

*Me barek dar bi kerê anî.*

Bar: *Barek genim, barek ceh, barek dar...li ser pişta dewaran diguhêzin.*

Piştî: girêdanek ji darik, qırşık û pûşê, ku mirov bi pişta xwe hildigire. Pîreka Kurd piştiyên daran û ên qırşan li ser pişta xwe, ji çolê di guhezte mala xwe. Ji ber ku, li ser pişta xwe diguheztin, piştî nav lê kirine.

Vêce ez dibêjim, ji ber ku, bar û piştî serdestî pişta mirov û a dewêrin; lewre, zayenda nîr sitandine

Melû: Qersela zadî dema dicinin, jê re melû dibêjin.

Palevan bi dasa xwe zadî dicîne û ta ku dikare bi milê xwe hilgire, li pey xwe rêz dike, her komikek ji wî zadî navê wê melûy e. Eger em bi navê milek pûş dibêjin, zayenda mil ku nêre distîne, lê melû navek ji xwe re standiye, û gelek li komikê jî diçe, zayenda mî standiye.

Kurtanê ser pişta dewarê, zayenda wî nîr e. Lê bermilk, ya ku ji kurtan bicûktir e û dikeve ser milê dewaran,

zayenda wê mîye. Bermilk jî wek melûyê zayenda mî ku ji zayenda navê mil cihê ye standkiye.

Zîn jî mîye. Lî hevsar nîre. Hevsar, di bingeh de (hev û ser)e. Li vir hevsar, zayenda serî ku nîr e standkiye.

Navteng: Ew jî weke şûnika pişta pîrekê, zayenda mî sitandiye. An jî ew ji du gotinan (nav û teng) pêkhati ye û ev herdu navdêr zayenda wan mî ye.

Navtenga hesp;du wateyan dide:

- 1) Teng: Newq.
- 2) Teng û şûtik jî jêre dibêjin.

### 34. CIL Û BERK (berg)

Laşê mirov nîr e, û çi cila ku mirov li ber xwe dike, zayenda wê nîr e.

Mînek: Vî kirâsî (gir û laş), wî bînkirasî, wî şalî, wî şapikî, wî êlekî, wî sermilî, wî kurtekî, wî xeftanî, vî çakêtî, vî kulavî, wî sakoyî, derpêkurtik, derpiyê dirêj...

Tığta ku tê girêdan, û nehatiye dirûtin, zayenda wê mî ye. Wek: Vê destmalê, vê şasikê, vê piştikê, wê bazbendê, wê goreyê (ew jî berê dihate girêdan), vê pêlavê, pêlav ku berê çarox bû, ew jî dihate girêdan, bersing (berdilk), ya ku li ber singa biçûkan girêdidan, mî bû, ji ber ku , ew jî girêdan bû, lê gava ji bo şagirtan jî, li dibistanê bi kar anîn; li gel ku wek kiras tê dirûtin jî, lê ji ber ku ,wek bersinga zarokê bi ser hemî cilên xwe de li xwe dike, nav jî berdilk (bersing) lê kirin; ji lewra zayenda wê jî mî hatiye.

Pêşmalik jî bi benekî (şûtik) li newqa xwe girêdidin, zayenda wê jî mî ye.

Devzendik, zayenda nîr sitandiye, devzendik ji du gotinan pêkhatiye ((dev û zendik)), dev nîr e û zend jî nîr e, dibe ku ji ber vê be. an jî wek hemî cilên dî ku zayenda wan nîr e, ew jî nîr hatiye.

Zendik (devzendik) jî biçûkkirina zende, û ji bo heman ho, wî jî zayenda nîr sitandiye.

Qewlikê quranê jî weku kiras hatiye, û zayenda wî jî

nêre.

Tûrik, çelte û kîsik, zayenda wan nêr e.

Qewlik, dibe ku jî gotina kevlik; biçûkkirina kevel hatibe.

### 35. PÊWISTIYÊN MALÊ (modêrn):

Pêwistîyêن malê ku bi kehrebê (eletrîkê), an jî bi beta-riyan kar dikin, hemî zayenda wan mê ye, wek: *Televiz-yona me, radîyoya me, wê cilşokê, vê radiyoyê, perwane (bawesênk), ütîya me bi kehrebê kardike. Kembiyotera me a sala 1995 ê ye. Ettariya (alava leyistokan) kurê min heye.*

### 36. ALAVÊN GUHESTINÊ:

Alavên guhestinê, zayenda wan mê ye. Wek: Terembêla min nîne. Ereba dewaran jî me nîne. Biskilêta kurê min kevne. Vê qeyikê, vê kelekê, vê gemîyê, vê firokê, vê balafirê, kemyona bavê min ne bû. Pîkaba mirovekî me hebû. Ev tirêna ha, gelek kevn e.

### 37. ÇEKÊN ŞER Û KÛŞTINÊ:

Hin ji van alavan, zayenda wan mê ye, û hinên dî nêr hatine. Tiving, fişek, kêr, xencer, tîra kevan; zayenda wan mê ye.

Berê tivingê, kevan û şûr, zayenda wan nêr e. Gurz, mertal, zayenda wan nêr e.

Ev çekêن me navê wan gotin, çekêن şer ên kevn in. Lê çekêن şer û kuştinê ên vê ser demê, zayenda wan mê ye. wek: Qumbere, narincok, top, sarox...Kurmanc dibêjin:

„Topa xwedê li mala te bikeve“  
Vê narincokê, vê qembereyê...

### 38. BINYATA MAKDERÊ Û PAŞGIRA (EK)

#### NAVÊ ALAVEK DIDE

Binyata makderê li gel paşgira (ek), navê alavek pêktîne. Ew navê nû jî, wek wî navê ku, jê pêkhatiye, zayenda xwe distîne.

Birrîn mî ye, birrek jî mî hatiye. Birrîn, dibe birrek.  
*Bireka me winda bûye.*

*Birrîna vî darê hişk, bi vê kêra kuh çenabe.*

Pêçan dibe pêçek

Pêçan, navê kare û zayenda mî distîne, pêçek jî alavek mî ye.

*Pêçana te ji vê desmalê re, ne tekûze. Pêçeka zaroka te sipehî ye.*

Badan, dibe badek (tornefis)

Badan, zayenda mî distîne, ji ber ku navê kar e, vêce ew navê jê çebû ye, yê ku badek e ,ew jî zayenda mî distîne.

### 39. LEYISTIK

Leyistikênu mirov pê dileyize, zayenda wan mî ye.  
Mînek: *Bûka mîra, leyistika çitrê, me cîra we bir.*

Damê û nehberkê. Werin em bi nehberkê bi lîzinç  
Leyistika holê jî heye, ew jî zayenda wê mî ye. Me hola we bir. Di vê leyistikê de kaço nêr e, ji ber ku, kaço darekî dirêj ï şahîk e, û ji rexê ku pê li gokê dixin weha çilakî ye, ango xwehr e, û ji rengê dar ne ketiye. ji lewra zayenda darê hişk, ku nêre sitandiye. Lê gok, her çende ew jî, ji darê hişk e, lê ew ji rengê xwe ê pêşî dûr ketiye, weha gurover bûye, tiştek nû derketiye. Herweha guk li ber kaço jî lawaze. Û ez dibêjim ji ber vê jî, zayenda mî sitandiye.

Leyistikênu di nav destêni zarakan de ne, li gora şêwesaziya wê leyistikê ye; eger di rengê hespek de bê, wê zayenda hesp bistîne, ku nêr e. Lê eger leyistik firoke be, zayenda firokê, ya ku mî ye distîne. Û eger bûkik bê, wê zayenda mî bistîne.

### 40. PÎSÎ Û GEMAR:

Pîsî (gû), zayenda wî nêre. Lê hemî gemar û qirêja mayî zayenda wan mî ye.

Mînek: *Wî gûyî, wî pîsiyî. Vê mîzê, vê rîxê, wê pişkulê, wê serkilê, wê zelqê, wê cilmê, wê lîkê, wê kenîştê, vê tenîyê,*

*vê xuhdanê vê qirêjê, vê gemarê....*

#### 41. ASMAN:

Asman bi xwe, zayenda nêr distîne, lê hemî ew navdê-rên ku di nav asmanî de ne, zayenda wan mî ye. Wek, heyv, roj û stêr.

*Asmanê şîn. Roja azadî, wê kengî li me hilê?  
Heyva me yek şevî ye. Stêra wê ji asmanî rijaye.*

#### 42. HEWR(ewr)

Hewr, zayenda wî nêr e. Lî hemî tiştêr ji hewr dirijin û dibarin, zayenda wan mî ye. Wek, *berf, baran teyrok (terze), xunav, av, avih, şape, lehî*.

*Berfa zozanêr Kurdistanê, ta meha tebaxê jî, li kopêr çiya dimîne.*

*Barana avdarê, ji bo çandinîyê gelek baş e.*

*Xunaveke hûr dibare.*

*Ava bîra me çikiya.*

*Avîhabiharê digre rûyê giyayî.*

*(Şapa meha gulanê bikeve mala dijminan)*

Kurmanc weha dibêjin: *Lehîya çemî rabûye û gelek tiştêr gundiyan li ber xwe birine.*

#### 43. BA

Ba nêre. Lî hemî ew navdêrên, ku ji bayî bi nav dibin, an jî resenê wan ba ye, zayenda wan mî ye.

Wek: Bahoz, badev, baguv, babilîsok, bager, seqem, serma, qeşa (sehol), şembelilik... Dibêjin, *vê bahozê, vê badevê, vê babilîsokê, vê bagerê, ji seqemê destêr min cemidîne. Serma vê zivistanê dijwar e. Ezê di vê bahozê de biçim ku?!*

*Li vê şembelîlkê binêr e, çawa ava şirikê bûye qeşa  
û şembelîlkeke mezin dirustkirye.*

#### 44. AGIR

Agir, piring û dû, zayenda wan nêr e.  
*Vî agirî, agirê daran. Wî piringê agir, piringê sor.*  
*Dûyê tepikan gelek hey e. Dûyê agirê daran hindik e.*  
Lê besên mayîn, yên ku bi agir ve girêdayî ne, zayenda wan mî ye.  
Mînek: *Gurriya agir, pêta agir, çirîsoka agir, rijûya agir, kûmira daran.*  
Birûsk û bîlec jî, zayenda wan mî ye.  
Agirdan û tenûr, zayenda wan mî ye. Ji ber ku ev herdu navdêr cihekî agir ê taybet e.  
û berê me got, dema cihek bi nav bû, zayenda wî mî ye.

45. DEM: Hin kes bi zayenda mî, û hin jî bi zayenda nêr dinivîsin.

Ezê hin malikan ji helbestêن kilasîkêن kurmancan binivîsim.

Cizîrî dibêje:

„Wê mecalê ku cemala xwe tecella dikiri  
Lazim e secde bibin ber te di wê gav û demê  
Dibazim her wekî goyan  
Dema ew têne meydanê  
Dema ew têن bi bazî têن  
Digel qewşen Şîrazî têن“<sup>36</sup>  
„Mihrabê du birhêن te bibînit arif  
Niyet ci bi cih têtî dema tekbîr“<sup>37</sup>  
„Nazika min her dema bêtin xeram  
Sed hezar dil wê li pê hev der qefa“<sup>38</sup>

Li gora van mînekan, Melayê Cizîrî, zayenda mî daye navdêra (dem).

Em bêne ser mamostayê mezin Ehmedê Xanî û hin

<sup>36</sup> *Dîwana Melayê Cizîri*. Jêdera berê r. 221.

<sup>37</sup> Jêdera berê r. 242.

<sup>38</sup> Jêdera berê r. 297.

malikan ji helbestêن wî, ji Mem û Zîn:

„Roja ku dibûye idî Newroz  
Tazîm i ji bo dema dilefroz“<sup>39</sup>

„Gava kete sûretê cîhanî  
Pêxemberê axiruzzemanî“<sup>40</sup>

„Ev mujde ewan dema kirin gûş  
Yekcari ji şahîyan nema hûş“,<sup>41</sup>

Di van mînekan de em dibînin, ku Ehmedê Xanî jî,  
zayenda mê bi navdêra dem daye.

Dem û wext zayenda mê distînin, û hemî ew navên ku dem  
nîşan didin, zayenda wan mê ye.

Mînek: *Roja Newrozê, heyva gulanê, sala bîhûrtî, vê  
biharê, vê payîzê, vê zivistanê, vê havînê, vê bîhnê, vê  
kêlîkê, vê dempîvê (saetê), dema ez hatim, dema tu çûyî*.

#### 46. PÎVAN Û KÊŞAN

Dirêjîya zevî, pehnîya wî, ferehîya xanî, kûrahîya çalê  
û tengîya wê, ziravîya rê, sitûrî û tenikî, giranî û sivikî,  
zayenda wan mê ye.

Alavên pîvanê, mitir, kîlo û beşe biçûk û beşe mezinên  
wan, hemî zayenda wan mê ye.

Kîloya şekir. Mitra kirt (qumas). Gaza caw.

#### 47. BİÇÜKKIRIN

Tiştîk biçûk dibe û tiştîkî dî dide.

Eger tiştîk biçûkkirina tiştîk dî ye, zayenda wî tiştî  
distîne, wek: Zend, zayenda wî nêr e, zendik jî zayenda wî  
sitandiye, û nêre. Vî destî, vî destikî (destikê ku pê  
radihêjin beroşa germ), destikê hêkpêjê, destikê kêtê û ê  
derî. Destikê zêr yê ku ji bo xemla zarokan bi kartînin. Ker

<sup>39</sup> Ehmedê Xanî. Jêdera berê r. 120.

<sup>40</sup> Jêdera berê r. 30.

<sup>41</sup> Jêdera berê r. 188.

zayenda wî nêre, kerikê ûtîyê jî nêre.

Li vir em dibînin ku, kerikê ûtîyê zayenda kerê nêr sitandiye. Di nav civaka kevin de, li gor pêwistîyên wan; kerikê daran û ê tepikan jî hebûn. Dema darêñ birî ên ji bo gewatê li ser hev dinijinîn, jêre kerik digotin. û tepik jî li ser hev bi rêz dihûnan û bilind lêdikirin, ji wî re jî kerikê tepikan digotin.

Pişt zayenda mî sitandiye, pişteka derî jî, zayenda mî sitandiye.

Sitîrhê pez û dewaran, zayenda wî nêr e, sitîrhik jî zayenda wî nêr e.

Bin, binê xanî, binê bîrê, zayenda nêr sitandiye, binikê fincan û binikê şûşa çayê jî, zayenda nêr sitandiye.

Zayenda dev nêre, devikê şûşê, devikê qotikê, zayenda nêr sitandiye.

Telî mî ne, ji bo vê jî em dibînin; penc, kulm, mist, tep, buks, zayenda wan mî ye.

#### 48. NAVÊN RAZBER

Navdarêñ, ku mirov bi her pênc hestêñ xwe nikaribe wân nas bike, lê bi ramana xwe û di sewdanê xwe de nas bike.

Ji van navan, sewdan û hiş zayenda wan nêr e, lê çi gotinêñ bi hiş û sewdan ve girêdayîne, hemî zayenda wan mî ye.

Mînek: *Bîr, bawerî, roşinbîrî, hişyarî. Vîn, hêvî, hevalî, biratî, bextiyarî, zanîn, xweşî, bextreşî, zordarî, sitemkarî...*

*Ev tişt li bîra min ne maye.*

*Di bawerîya min de, wê Kurd serkevin.*

*Roşinbîrîya Ehmedê Xanî, di wê serdemê de, gelek bilind bû.*

*Kêşa me pêwistî bi hişyarîya gelê xwe heye.*

*Bi vîna gel, em dê bí ser kevin.*

*Hevalîya rast, biratî ye.*

*Xweşîya me di rojekê aştî de ye.*

#### 49. PESN, GILEH Û GUNEH:

Ev hersê nav, di hin zaravan de zayenda mî, û di hinan de zayenda nîr bi kar tînin.

Gileh: Gilehê min li rex bavê min neke; ew dê li min bide. Dema mirovek bi nexweşîya sermayê dikeve, jêre dibêjin: „*Gilehê te li xesûya te*“ bi wateya ku jêre dibêjin bila xesûya te bi sermayê bikeve, ne em pê bikevin.

*Guro, mirovekî nebaş e; wî gilehê gundîyan li nik polisan kir û ew dane girtin.*

Guneh: Gunehêne wî pir in, ango wî gelek karêñ çewt û nebaş kirine.

Gunehkar, ew mirove yê ku karêñ çewt dike, yê ku xweda û mirov jê nexweş bin. Zordarî, gunehkarî ye.

Gunehbar, ew e, ku guneh lê bar dibin. *Ez barê vî gunehî hilnagirim. Ez vî karî nakim, û xwe gunehkar nakim.*

*Min ev tişt ne bi mebesta nebaşî kir, û xwedê min guneh bar neke. Mirovê baş barê gunehan hilnagire.*

*Mirov, paş mirinê bi agirê gunehêne xwe dişewite.*

Wateyeke dî jî heye, ku dibêjin; gunehê min pê hat, ango dilê min pê şewitî û ez ber dikevim.

Mirovekî guneh e (bê guneh e), dûr belaye.

Ji gunehê min bû, ev bi serê wî hat; xwêdê tola min jê sitand. Navdara guneh bi herdû reng û wateyan, zayenda nîr distîne.

Lê mamostayê mezin Ehmedê Xanî ji bo vî navî, zayenda mî bi kar anîye û di Mem û Zînê de dibêje:

,*Ez hatime vê demê jî ba wan*

*Emma guneha me tê bi lawan*“<sup>42</sup>

Ji bo vê jî, M. E. Bozarslan, dibêje: „Xanî li vir peyva guneh, wek peyvikeka mîyî bi kar anîye û gotiye (guneha

<sup>42</sup> M. E. Bozarslan: *Ehmedê Xanî*, Jêdera berê r. 194.

min); lê di zimanê peyvînê da bi piranî peyvik wek peyvikeka nêrîn tê karanîn û tê gotin (gunehê min) yan (gunehê min hat)<sup>43</sup>.

### 50. MAKDER (çawik)

Kar, zayenda nêr distîne, lê hemî navên kîrinê, zayenda wan mî ye.

Makder, wekû navê kîrinê, zayenda mî distîne.

Mînek: Lêkirin: *Lêkirina te ji vî dîwarî re, gelek sipehî ye.*

Cînîn: *îro cînîna genimê me ye, ezê biçim melûyan komkim.*

Kuştin: *Serê birakuji, kuştina canê xebatgêriyê ye.*

Bihîstin: *Ez li xwe derdixim, ku bihîstina mîn kêm bûye.*

Xwestin: *îro xwestina keça min e.*

Şikestin: *Şikestina leşker di anîya şer de, metirsi ye...*

Şikestina vê camê; bi destê Azadî bû.

Nivîsandin: *Nivîsandina bi tîpêñ Latînî ji bo zimanê Kurdi gerek e.*

### 51. GOTINA DUMIL (gotina cot)

Zimanê kurdî, zimanekî li ser wateyê ava bûye. Gotina dumil, ya ku ji darêja xwe a pêşî dûr neketibe, û tu tîp ji gotinê ne keti bin, wateya wê xuya ye, û zayenda wê jî tê naskirin, ji ber ku, herdu navên li hev siwar, ên wê belo ne, zayenda wê jî bi vî rengê xwarê tête naskirin:

#### 1) RENGDÊREK Û NAVEK

Dema ku navdêrek ji du navan pêk hatibe û navê paşî rengdêr be, zayenda navê dudoyê distîne. Wek: *Pîrejin, Pîremêr, germav, kevnekiras, sorgul...*

Pîrejin ango jina pîr, pîremêr jî ango mîrê pîr, ava germ, kirâsê kevin û gula sor; di van hemî mînekan de, mebesta me navê dudoyê ye, ji lewra jî zayenda navê dudoyê distîne.

<sup>43</sup> Jêdera berê r. 194.

Pîrejin, zayenda jin ku mî ye distîne. Pîremêr, zayenda mîr ku nîre distîne. Kevnekiras, zayenda kirâs ku nîre distîne. Dema em kevnekiras dibêjin, mebesta me kirase, ne kevn e. Ji bo vêye, em zayenda navê dudoyê ku nîre distînin.

Di van mînekan de, em dibînin ew navê, ku dumil e her û her, zayenda navê didoyê, yê ku mebest jê ye distîne.

## 2) NAVEK Û NAVEK

Dema ku navdêrek ji du navan pêk hatibe, zayenda navê mebest yê ku em ser wî dipeyivin distîne. Wek:

*Jinmam (jinmama min), Jinxal (jinxala min), Jintî (jintitya min), dêmar (dêmara wî), réziman (rézimana kurdî), amojin, xalojin û birajin...*

Di her pênc mînekên pêşî (*Jinmam, Jinxal, Jintî, dêmar, réziman*) de, mebesta me jin, dê û rî ye, ji lewre jî navdêra dumil, zayenda navê pêşî distîne. Di her sê mînekên dawî de (*amojin, xalojin û birajin*), *am, xal û bira*, zayenda wan nîre, lê navdêra dumil zayenda jin ku mî ye distîne; li vir navê dudoyê sitand; ji ber ku mebesta me jin e, ne mam, xal û bira ye.

Em dibêjin: *Amojina min, xalojina min û birajina min.*

## 3) SER Û NAVEK:

Ew navê, ku ji navê ser û navekî dî pêkhatiye, zayenda wî navî distîne.

Serbar: Li çaxa koçerî û çandinîyê bi kar tanîn; dema ku, barê dewarê bardikirin, û hin ji pêwistîyan „têra mewîjan tijî bû û hin mewîj li erdê man“ ji bo ku wan mewîjan bi şûn xwe de ne hêlin; di nav paçekî an jî tûrekî de di danîn û li ser bar girêdidan, û jê re serbar digotin. Serbar jî, weke bar zayenda nîr distîne. Ji ber ku, ew jî bare; barê ser bare. Serkom, navê didoyê ku kome zayenda mî distîne, ji lewra serkom jî, zayenda mî distîne.

Sercem, Cem (cema têrê) mî ye, ji lewra sercem jî divê mî be. Di van mînekên jor de, careke dî em dibînin, ku gotina dumil, zayenda navê didoyê distîne, jîberku mebesta

me navê didoyê ye.

#### 4) BER Ú NAVEK

Ber; di kurmanciyê de, ev navê ha li pêşıya gelek navan hatiye, û ew navê dumil yê, ku pêk jî hatiye, her û her zayenda navê didoyê standiye.

Berpal: Gotina pal, weku navek ew jî, zayenda mî distîne, ji bo vê jî, em dibînin, ku berpal jî, zayenda mî sitandiye.

Balgehî dane ber pala xalê xwe.

Berpala xalê xwe xweşkeç

Berstu: Berstuyê min têse. Stu, zayenda nîr distîne, berstu jî zayenda nîr standiye. Berstûyê min qerimîye.

Bernav, nav, zayenda nîr distîne; bernav jî, zayenda nîr distîne. Navê didoyê nîr e.

Berroj: Roj, zayenda mî distîne; berroj jî, zayenda mî distîne. Berroja xaniyê me xweş e.

Berbang: Bang, ji bangdanê hatiye, zayenda mî distîne, berbang jî, zayenda mî distîne. Bi banga melê re, ez hisyar bûm. Ji berbangê ve, ez hisyar im.

Bernivîsar: Nivîsar, mî ye; bernivîsar jî ,mî ye.

Gotina dumil; ya ku, ji ber û navek pêkhatiye, zayenda nav distîne.

Berbanik: Ev navê ha li gel ku, zayenda navê didoyê banik e (biçûkkirina ban e) jî, lê zayenda berbanikê mî ye; ji ber ku, ew, navê cihek nîşan dike.

Berbanka kurmancî rengê belkona (verende) iro ye.

#### 5) BIN Ú NAVEK:

Binçen: Binçena min werimî ye. Çen (Çenage) mî ye; binçen jî mî ye.

Binguh: Guh, zayenda nîr distîne, binguh jî, zayenda nîr sitandiye. Binguhê min qelişîye.

Binav: Av, zayenda mî distîne, binav jî, zayenda mî

standiye. Binava vê deverê kûr e.

Binkun: Kun (qul), zayenda mî distîne, binkun jî, zayenda mî distîne, ev cih binkuna mîroya ye. Herweha navê cih jî dide.

BINSER: Binserê min nexwes e.

Binpehnî: Pehnî, zayenda mî distîne; binpehnî jî, zayenda mî distîne. Binpehîya min qelişîye.

Binecih ji vê bendê dere; wek navê cih bi kartêt, û zayenda mî distîne. Bavê min digot:

*Em gîhabûn bineciha xwe.*

*Bineciha te li kuye?*

Lê di malê de, û li dema raxistina cihê razanê, em dibêjin; bincihê xwe rastke, an jî bincihê serê min nexwes e; gereke ew jî zayenda cih bistîne û nêr be. Lê binecih, wek navê cihekî bi kartînin, ji ber wê ye jî, ku zayenda mî sitandiye.

#### 6) PAŞ Ü NAVEK:

Paş jî navek e û li gel navekî dî, navdêreke dumil pêk tîne. Ev navê nû, zayenda navê dudoyê distîne.

Pasguh: *Gotina min, li paşguhê xwe ve avêt.*

Ji ber ku, guh nêre, pasguh jî nêr hatiye. Zayenda navê didoyê sitandiye.

Paşiv: *Paşîva me dereng bû.*

Şîv, zayenda mî distîne, paşşîv jî, zayenda mî distîne.

Paşkar: *Paşkarê te, ci encam da?*

Gotina kar, nêr e, paşkar jî nêr hatiye.

Paşdem: *Paşdema bê, em dê ci bikin?*

Dem, zayenda mî distîne, paşdem jî, zayenda mî distîne.

Paşxistin: Xistin makder e, û zayenda mî distîne, paşxistin jî, zayenda mî distîne.

*Paşxistina civînê ji bo ci bû?*

#### 7) PÊŞ Ü NAVEK:

Pêşgotin: *Pêşgotina te di kovarê de xweş bû.*

Gotin mē ye, pêşgotin jî , mē ye.

*Pêşxistina civînê ji bo ci bû?*

Xistin makdere û zayenda mē distîne, pêşxistin jî , mē ye.

Pêşçinîna genimî.

*Pêşberê xwe binêre.*

Hemî ew pêşgirên hene, û eger me, ew pêşgir jî weku navek jî dîtin, her û her gotina dumil, zayenda gotina didoyê distîne.

### 8) NAVEK Û MAKDEREK (bûn, kirin)

Navek bi makdera bûn re, an jî bi kirinê re, navek nû dide û zayenda mē distîne.

Mînek: Sor: Sor bi xwe zayenda nêr distîne. Gula sor, sor, li vir rengdêr e. Eger me makdera (bûn) pêve kir, dibe sorbûn.

*sorbûna çavên min, ne ji xwe re ye!*

(sor û kirin) „sorkirin“:

*Sorkirina porê bi sorê hinê spehî ye. Rengê porê sorkir.*

*Sorkirina rûn ji bo girarê ye. Rûn pijîha; hate qelandin.*

(Reş û bûn) *Reşbûna lêvan nexweşiyekê dixe berçavan.*

Reşbûn li gel tîpa hevbendî (a), zayenda mē distîne.

Reşkirin: *Reşkirina çavan bi kilî sipehîye.*

Şînbûn: *Şînbûna ber cavêن te; ji wê ketinê ye?*

Şînkirin: *Şînkirina nîvê jêr, ji dîwarê hundîrî, rêzika bav û bapîran e.*

Bi vî awayî, hemî reng li gel makdera (bûn) û ya (kirinê), têne bi karanîn, û zayenda mē distînin.

Hin gotinêñ dî jî hene:

*Xwes, xwarina xwes. Xwes li vir rengdêr e. Xwesiya xwarina te, di tújîya wê de bû. Xweşî, bi (î) kutah dibe, zayenda mē distîne.*

*Xwesbûna xwarina te, hişt em gelek bixun.*

*Xweskirina te ji me re, hişt em bimînîn.*

Sax: *Mirov gerek e di saxiya xwe de, karekî baş bike.*

*Saxiya te dixwazim.  
Saxbûna wî, ji me re gelek giring e.  
Saxkirina wî, li ser destê te bû.  
Ker: Zînê ker e. Kerîtîya Zînê ji guhê rastê ye.  
Kerbûna zînê ji zikmakî ye. Xwekerkirina te, ne ji xwe de ye.*

### XURTBÛN Û XURT KIRIN:

*Xurtbûna laş ne bidest mirovî ye.  
Xurtkirina laş di riya werzişê de çêdibe.*

Ew makderên ji du gotinan, ji navekî û ji (bûn an kîrinê) pêk têñ, paşgira hevbendîyê (a) distînin, ango zayenda wan mî ye. û bi vî rengî gotin gelek hene. û ez dibînim ku, hemî ew nav rengdêr in, wek xurt, dibe xurtbûn, an jî xurtkirin. Sax, dibe saxbûn, an jî saxkirin....

### 9) NAVEK Û BINYATA MAKDERÊ:

Serşok: „Ser û şok“ (şûştin), zayenda navê kar (şûştin) ku mî ye distîne.

Destşok jî wek serşokê ye; dest û şok (şûştin), zayenda navê kar ku şûştin e distîne. destşok navê cihe û navê alavekî ye.

Avşok: Av û binyata makderê, zayenda mî distîne. Ji dewê ron yê, ku ne tîr e avşo dibêjin. Dema piyan şûna mast be, bi avekê dişon û hingê ew avşo ye. Avdeşo jî dibêjin.

### 10) PAŞGIRA (ayî)

Di kurmancîyê de, ew gotina, ku ji sê (3) tîpan pêk-hatiye û tîpa nêvî dengdêr e; (ayî) bi ser ve dibe û gotinek e nû dirust dike.

Hemî navê rengan digre, û hin gotinê din. ci navê, ku ev paşgir pêve dibe, zayenda wan mî ye.

Mînek: Reş, dibe reşayî (reşahî). Di reşayîya şevê de mirov rîya xwe nabîne. Reş, navê rengê reş e; çarçefâ min reş e. Li vir em dibînin, ku rengê çarçefê reş e. Bi wateya,

ku jê re dibe pesn; di giramêrê de rengdêr jêre dibêjin. Lê ez nikarim bêjim, ez di reşê şevê de dicûm; divê ez bêjim di reşayîya şevê de dicûm.

Lê dema paşgira (î) bi ser ve dibe, navdêreke razber pêktîne. Mînek: reş, dibe reşî û li gel navdêreke dî, navdêreke dumil pêktîne.

Mînek: *dilreşî, cavresî, rûreşî,..*

Reşê tarî, reş li vir, zayenda nêr distîne. Lê eger megot; reşayîya şevê (reşayî), ku ji navê reş dirust bûye, zayenda mêt distîne. Herweha rûreşî jî, zayenda mêt distîne.

ŞîN, dibe şînayî (şînahî). li hin zaravan tîpa (h) li cihê (y) dibêjin. Şînahîya asmanî, sipehîye. Lê kurmancan, navdêra şînî ji şînbûnê birine; bacan, îsot şînîn e, dibêjin şînîyê me îsal baş e.

Sor, dibe sorayî. Sorayîya (sorahîya) rojê, di rojava de sipehî ye.

çavşorî jî, navdêreke razber pêkaniye.

*çavşorîya mirovê dardest, ji bêwijdanî ye.*

Zer, dibe zerayî. *Zerayîya rojê jî ne mabû, lê em çûn û me réya xwe bire serî.*

Rengê rojê ê zer, zerayî dide û beladike.

Tehl, dibe tehlayî. Lê, di axivtinê de tehlî jî dibêjin; sivik kirin e.

*Tehlayîya vî giyayî dijwar e. Tehliya vî giyayî dijwar e.*

Şor, dibe şorayî. û şorî jî dibêjin: *Şorayîya xwarîna te gelek bû. Ji şorî min nekarî gelek bixum.*

Kesk, dibe keskayî. Herdu tîpên (sk) di gotina (kesk) de wek yek tîpê cihdigrin.

Teng, dibe tengayî (ng) bi yek tîpê têr hejmartin.

*Tengayîya destê wî hiştîye ew çavteng jî bibe.*

Tengî jî dibêjin.

*Cavtengîyê neke...*

Di van navên, ku di mînekan de ne; gotin ji sê tîpan pêkhatiye, û tîpa nêvî dengdêr e. û ya ku, çar tîpe û du tîpên bêdeng li dawîne; ew jî weke sê tîpan cih digre. Merd, dibe merdî...

Ji van mînekan diyar dibe, ku ev navdêrên ha, bi herdu awayan çêdibin. Anglo em dikarin, tengî an jî tengayî binivîsin. Lê wa diyar dibe, ku (î) wê bi serkeve; tengî li cihê tengayî cih digre.

### 11) PAŞGIRA (î):

Ci gotina ku ji sê tîpan bihtir be û tê de tîpa bortalî dengdêrbe, (î) pêve dibe û navek nû dide, û ev gotin zayenda mî distîne.

Giran, dibe giranî. *Giranîya vê salê em êşandin.*

Arzan, dibe arzanî. *Arzanîya xwarinê, zikê hejaran tijî dike.*

Belengaz, dibe belengazî. *Belengazîya miletê me xelk neçar kirine, ku jî welatê xwe birevin.*

Perîsan, dibe perîsanî. *Perîsanîyê ew bê dest û pê kirye.*

Giran, dibe giranî. Şivan, dibe şivanî. *Şivanîya vî xortî bi camérî bû.*

Hejar, dibe hejarî. *Vê hejarîyê em ji pê xistine.*

Xwes, dibe xwesî. *Xwesîya welatê me nayê pesindan.*

Dilovan, dibe dilovanî.

*Dilovanîya dayikê, bi rasti ye.*

Bedew, dibe bedewî. *Bedewîya wê, di pora wê a sipehî de ye.*

Zozan, dibe zozanî. *Zozanîya bê terş kes nedîtiye.*

Hozan, dibe hozanî. *Hozanîya bê zanîn, cih nagire.*

Bihar, dibe biharî. *Ev rojeke biharî ye. Biharîya li çiya xwes e.*

Ciwan, dibe ciwanî. *Di ciwaniya xwe de wî, tu kar jî xwe re nekir...*

Heval, dibe hevalî. *Hevalîya min û te biratî ye.*

Di roja îro de, hevalî dibêjin. Lê ez dibêjim, ku ew şâsiye; mixabin, ku vê şâsiyê cihê xwe girtiye... Herwekî gelek şâsiyan di zimanê me de cêhê xwe girtine.

Rencber, dibe rencberî. *Rencberîya zaroyên min weste.*

Nêçîrvan, dibe nêçîrvanî. *Nêçîrvanîya mîrekên kurdan, di*

*biharanî de; geşt û seyrana li nav gelî, çiyan bû.*  
Neyar, dibe neyarî. *Neyarîya dijmin hîştiye, ku em tuxm-*  
*perest bin.*  
Xêrxwaz, dibe xêrxwazî. *Xêrxwazîya we ji me re camêrî*  
*ye.*  
Mêrkuj, dibe mêtirkujî. *Mêrkujîya Sedam ji bo kuştina*  
*Kurd û Ereban bû.*  
Rêbirr, dibe rêbirrî. *Rêbirrîya çetan di vî çiyayî de heye.*  
Dengbêj, dibe dengbêjî. *Dengbêjîya Şivan Perwer ji*  
*berxwedana gelê bindest re ye.*  
Dûrbîn, dibe dûrbînî. *Dûrbînîya mirovê zana encamên*  
*baş dibe.*  
Xwînrêj, dibe xwînrêjî.  
Nivîskar, dibe nivîskarî.

Hemî ew navên, ku ji çar tîpan bihtir e û tîpa berî dawî  
dengdêre, (î) pêve dibe, gotineke nû dirust dibe, û zayenda  
mê jî distîne:

Hin navên dî jî hene, wek: Dewlemend, dibe dewle-  
mendî. Bilind, dibe bilindî. Nalbend, dibe nalbendî.

Di van mînekan de, wa xuya ye, ku herdu tîpên bêdeng jî  
weke yek tîpê cihdigrin, û ji ber vê jî, em dibînin ku, ev  
nav jî dikevin bin siha wê benda li pêş me goti bû.

Di vê bendê dê tîpa ber talî dengdêr e, ji lewre (î)  
distîne.

Lê, gotina sê tîp jî, ya ku tîpa navî dengdêr e; tîpa  
bertalî ye. û ji ber vê ye ku (î) jî distîne. Anglo navdêra ku  
tîpa bertalî dengdêr e, paşgira (ayî) û ya (î) distîne.

Mamosta Qenatê Kurdo paşgira (anî) ji van gotinê  
xwarê re daniye: Jinanî, mîranî, bûkanî, soranî, Keçkanî  
(keçenî), xortanî, dostanî... Di van gotinan de, û bi  
pêçewanî Qenatê Kurdo, ez dibêjim, ku paşgira (î) bi  
gelejmara wan ve bûye, û ji van gotinan, gotina Soran,  
kome, anglo gelejmare; soran bûye soranî, herweha di  
devokan de dibêjin: bûk çû malbavan û dibêjin:  
malbavaniya bûkê.

Vêce ez dibêjim, ji gotina jinan jinanî çêbûye. û ji

mêran, mérânî û ji bavan jî, bavanî (bavêni) Ji ber ku dema ev gotin gelejmarin, tîpa bertalî dengdêr e û li gora benda berê me gotibû, paşgira (î) distînin.

### 12) PAŞGIRA (tî):

Gotina ku tîpa dawî tê de dengdêr be (tî) bi ser ve dibe, navê kar, ê razber dirust dike.

Bira, dibe biratî. *Biratîya bi camérî cihê pesnê ye.*

,,Biratîya quling û rovî ye“.

Paşa, dibe paşafî. *Paşatîya vî paşayî zordarî ye.*

Axa, dibe axatî. *Axatîya berê nemaye.*

Zava, dibe zavatî. *Zavatîya wî a çend rojan bû..*

Gundî, dibe gunditî. *Gunditîya gundîyên me, birati ye; ji hevudu hezdikin. Ev mejîyê hişk, ji dan û sitandina gundîtî hatiye.*

Cihû, dibe cihûtî. *Cihûtîya Cihûyên kudistanê bê astengî bû.*

Zaro, dibe zarotî. Bajarî, dibe bajarîtî. *Bajarîtîya bajarîyên Qamîlo, ji gundîtîyê dûr neketiye.*

Gurrî, dibe gurrîtî. *Gurrîtîya wî jî nexweşîyek e.*

Di van mînekan de, em dibînin, ku tîpa dawîyê bi deng e (dengdêr e). Vêce, mirov dikare bêje, ci navê, ku bi tîpeke dengdêr kotayî bîne paşgir (parkît) a (tî) distîne, û zayenda wê jî mê ye.

### 13) PAŞGIRA (dan)

Navek, çaxa ku ji navek û paşgira (dan) pêkhatibe, zayenda nav distîne.

Paşgira (dan) bi nav re.

Mînek: ça, dibe çadan. *çadan me biçûke. çadan mî ye.*

Gul, dibe guldan (guledan). *Guldana te sipehîye. Guldan mî ye.*

Mûm, dibe mümedan.

Mêş, dibe mêşedan.

Xwê, dibe xwêdan.

Xwelî, dibe xwelîdan.

Dema tîpa dawî bêdeng be, (e) yek ji berî (dan) tê nivîsandin.

Li vir, em dibînin, ku ev nav hemî zayenda wan mî ye, û ew alavên, ku ji wan navan jî çêbûne zayenda mî sitandine, ev ji rexekî; û ji rexekî dî ve, ew alavên çêbûne hemî navê cih belo dikin, û navê cih jî zayenda mî distîne.

#### 14) PAŞGIRA (geh)

Eger navek ji navekî û paşgira geh pêk hat û navê cihekî belo kir, zayenda mî distîne. û bihtir jî em dibînin, ku navê cih dide. Lê eger navek, ji navekî û paşgira (geh) pêk hatibe, û ew nav ji bo alavekî bi kar bêt, zayenda wî navî distîne. Mînek:

NAV Û PAŞGIRA (geh): *Dergeh, mergeh, lîzgeh, cêrgeh, sîngeh..*

Der (derî), dev e û li paşê bi paşgira geh re bûye dergeh û navê alavekî diyar kiriye. û ji ber ku, der zayenda wî nîr e, em dibînin dergeh jî, zayenda navê ku dev e, sitandiye. Mergeh (mîrg), ji navekî ku merr e (pez) û paşgira geh pêk hatiye; navê cihekî belo dike, ji lewra zayenda mî sitandiye.

Lîzgeh, cihê leyistikê ye. Navê cih e û zayenda mî standiye.

cêregeh jî cihê çêra peze, û ew jî navê cih e, zayenda mî sitandiye.

Kargeh, navê cihê kar e.

Kongeh, cihek ji bo vedana konan e.

Cêgeh, cê û geh, navê tu cihan nade xuyakirin, belê cêgeh, maye cih ji ber vê ye , ku zayenda cih sitandiye ku nîr e.

Bingeh, bin û geh, bin zayenda nîr distîne, û ji ber ku, bingeh jî her bine, wî jî zayenda bin sitandiye.

Bergeh, ber û geh, ji ber ku, (ber) zayenda nîr distîne, û bergeh ne navê cihekî xuyakirîye, zayenda nîr standiye.

Raste bihtirê gotinan, yên ku li dawiya wan geh têt, navê cih belo dikin, û navê cih jî zayenda mî distîne. Lê ez

di wan sê gotinan de, navê cih nabînim; ji ber ku, navê cih jîndar û di tevgerê de ye. Ango dema ez bêjim kongeh; navê wî cihî ye, ku kon lê vedane. çêregeh, navê wî cihî ye, ku çêriya pez û dewaran lê şîn bûye. Lî di gotina bingeh de, ez navê cih nabînim. û herweha navê bergeh jî; navê wî bergehî çiye, ne xuyaye. Weku em bêjin gund; gund jî ta ku em navek lê nekin em nizanin ka ew ci gund e. Ji ber vê jî, ez dibêjim ku, ew sê nav gereke zayenda nêr bistînin, her wekî çawe dergeh zayenda nêr distîne.

### 15) PAŞGIRA (stan)

Paşgira (stan) bi ser navekî ve dibe û ew navê ji navek û paşgira (stan) dirust dibe, navê cihek belo dike.

Kurdistan, Erebistan, daristan, goristan, morîstan, gulistan... (i) ji bo sivikkirinê ye. Ji ber ku, navê cih didin naskirin, zayenda mî distînin.

Paşgira stan, eger bi ser navê kîjan gelî ve dibe; welatê wî gelî, ji me re belo dike. Bi wateya, ku navê cihek (welitek) şanî me dide.

Bil ji navê gelan, navên dî, yên ku (stan) bi dawiya wan ve dibe; zayenda wan navan mîye, wek; dar (darêن şîn), dibe daristan, dara heşîn mîye. Daristan cihekî, ku gelek dar tê de şîn bûne.

Li vir careke dî, em dibînin, ku navê cih nîşan dike. Gul, mîye, dibe gulistan. Gulistan ciheke, ku gelek gul tê de bişkivîne. Gulistan navê cih e.

Gor, zayenda wê mî ye, goristan jî mîye. Goristan; ew cihe, ku gelek gorêñ mirîyan tê de hene.

Morî (mîro), ew jî mî ye, li gel paşgira "stan" dibe moristan.

Morîstan; kunmîro ye, ku gelek mîro di nav de hene. Hemî ew navên, ku paşgira stan bi serve bûne, zayenda wan mî ye.

Lî, navdêra Dûstan, ji ber ku, alavek dide naskirin, û ew alav ne cihek mayîndar e, belê dûstan cihguhêz e, ji lewra, zayenda dû, ku nêre sitandiye.

## 16) PAŞGIRA (lîn):

Navek li gel paşgira (lîn), navê cih dide û zayenda mêt distîne. Mînek: Hêlîn, di bingeh de, hêklîn e; ew cihê, ku tilûr di nav de hêk dikan.

Kulîn, di bingeh de, kunlîn e. Bi wateya, ku kunek e (qul) û lîn pêve bûye; cihek ji bo kelûpelan daye xuyakirin.  
Kadîn, di bingeh de, ew kadlîn e, tîpa (L) nemaye, û bûye kadîn.

## 17) PAŞGIRA (war)

Şiwar (şıştin û war), warê şıştinê, ciheke ji bo şıştina mirîyan; ji ber ku, navê cihek diyar dike, zayenda mêt distîne.

Berwar bi du wateyan bikartînin; Kurmanc dibêjin:

a- *Berwarê te li kuye?* Ango berê rêya te li kîj cih û warî ye?

Li vir jî zayenda war distîne ku navê didoyê ye, ji berê jî zayenda wî nêre, ji ber vê jî; berwar, zayenda nêr standi ye, û navê cih nadî.

b- Berwar cû. Bi wateya, ku xwar cû.

Li vir jî, ez dibêjim, ji ber ku rêbwarên çiyayan her û her bi xwar û pêç in û warê (cihê) ku diçûnê de jî, bêguman di pêcekê ji wan pêçan de bû; ji lewra, her berwarek bi xwehriyekê dîtine. Berwar cû: *Ber bi warê xwe cû.* Berwar cû: *Bi xwehrî cû.*

Hin mînekên dî jî:

*Sûnwarê Qereçîyan.*

*Hevvarê hevin, ango welatiyê hevin.*

Xweşwar: Warxwes.

## 18) PÊSGIRA (hil):

Ev pêşgir bi ser makderê ve dibe û makderek nû dide, ew jî zayenda mêt distîne. Mînek:

Girtin, makder e. Girtin bixwe weke navek jî bi kartê û zayenda mêt jî distîne.

*Vê zarokê bigire! Da ne keve, girtina te ji vê zarokê re, nahêle, ku ew bikeve. vê çayê ji destê min bigre.*

Hilgirtin jî makderek e, û wek nav jî bikartêt, zayenda mî distîne. Belê hilgirtin wateyeke dî distîne; vê zarokê hilgire, li ser milê xwe, an jî li ser pişta xwe hilgire û ji vir bibe! Zarokê hilgire; bide ber singa xwe û bibe! Hilgirtina te ji vê zarokê re ne seraste... Girtin, bi dest tê girtin; lê hilgirtin, bi mil, pişt û li ber singê jî tê hilgirtin.

*Weşandin (weşan). Weşana pelan, li payîzê çêdibe; pel ji xwe re diweşin.*

Hilweşan (hilweşandin), ew jî makdereke nûye, û weke navek jî bikar têt, û zayenda mî distîne. Ev makder wateyeke dî heye, ku dibêjin savarî hilweşîne, ango ka, û kelpikê ji nav biweşîne!

Savar ji ber xwe ve nayê hilweşandin, divê kesek savarî hilweşîne.

Dêran: Makder e, û navekî giştî (gelempêrî)ye bi wateya belavkirin bi hewa ve tê; eger bayek xurt hat, ew kaya di nav genimê bênderê de ji xwe re tê dêran, û kayê ji nav genimî cuda dike. Belê genim, an savar, bi tena xwe nayê heldêran, hildêran, divê bi destê kesekî be.

Banghildêran, ango li cihekî bilind, an jî bi dengkekî bilind bangdikin. Vêce ji ber vê jî, ez dibêjim, ku pêşgira (hil) bi wateya ber bi bilindahî ve di çê.

Kışandin, makder e, û navekî giştîye. Kışandina şebeşan, ango guhestina şebeşan. Kışandina müyek ji nav mastî. *Dibêjin ev tiş hêsane, wek tu, müyek ji nav mastî bikişînî.* Bakişen ango ew alav e ku, bayî dikişîne xwe.

*Hilkişandin, bayê di bêvila xwe re hilkişîne!*

*Hilkişandina bayê pak, di dev û bêvilê re baş e.*

Kirin, makder e. Hilkirin, wateyeke din dide; Singî ji erdê hilke. Hilkirina singî ji vê erda hişk dijwar bû. Zayenda hilkirin jî, weke a kirinê mî ye.

## 19) PÊŞGIRA (da)

Xistin, makder e, zayenda mî distîne.  
*Xistina barê te ji bo çi bû? Min ew daxist.*

Naxwe, daxistina barî bi destê te bû?

Ketin, makdere, ez ketim, tu ketî...ketina me ji bêçarî bû.  
*Jî ser banî em daketin xwar; daketina me ji tîrsa baranê bû.*  
*Koçer ji zozanân daketin.*

Daketic jî weku-ketin, zayenda mî distîne.

Weravtin, makder e. *Kirasê te ji ava baranê werivî, û li ber vî bayî; ew dê ziwa bibe.*

Daweravtin (dawerivîn), *Kirasê xwe, dawerivîne, û li ser germiya agirê sopê ziwake.*

Pasgira (da), wateya ber bi jêr dide, û tim jî tê kirin.

Dakirin, me pezê xwe dakir; me kire govan.

Dakirin, dakirina pezî, me pezê xwe dakir; ji berîya, ku berf û baran bibare.

## 52. DUMILIYA NEDIYAR

Gelek gotin hene di nihêrtina pêşî de, weke gotina sade a yekla dixuye. Lê eger, mirov li dora rehên wê dikole; wate û dulayîya wê belo dibe. Wê çaxê zayenda wê jî tê naskirin. An jî, mirov dizane çîma ev nîr e û ewa ha mî ye. Lê hin gotin di roja îro de; ji ber ku, darêj û tipêwê weke xwe nemane, an wek yek gotinê dixuye. An jî, gutinek ji herdu gotinan li roja îro bîkar nayê, û ji ber wê jî, mirov bi hesanî bi ser wateya wê ve nabe.

Mînek: Gotina (şe), gotineke kurdî, ya ku di nav zimanî de nemaye, an jî, min pê nebihîstiye. Ji kerema xwedayı, ku ez li Ewropayê jî mezin nebûme; ez di nav civaka kurdewarî de mezin bûme. Bi wateya ku, min dikarî peybikevim; lê bi rastî, min ev gotin (şe), ta niha ne bihîstiye.

Vêce ez vegereham ser xebata xwe û min gotin dane hev. û ji wan gotinê, ku (şe) di nav de hebû, ev gotinê xwarê:

Şikevt: *Şikevt, şikevtika dev, şekîv, şikêr, fers, şihar...* Ez

careke dî li wan gotinê ku şkevt, (kev) dinav de ye, min ew jî rîzkirin.

Şikevt: Kolana di kevir de ye; çiya hatiye kolan. û di çiyayê Kurdistanê de, gelek şikevt hene.

Şekîv (şeqîf): Ew jî neqebeke kolayî di çiyê de ye; ango ew jî di kevir de, hatiye kolan..

Şikêr: Komeke keviran bi rengê gurover; ji binê xwe ve gêr daye. Min got, bingehê vê gotinê (kevîrgêr), ango gêra keviran.

Ferş: Kevirekî ferehî pehne. Li vir jî min got ku bingehê gotinê (fereşe)ye; fereh û şe.

Şihar: *Erdeke têr kevir e.* Li vir jî, em dibînin, ku gotin şeyar e; erda bi şe. Di kurdiyê de (y) û (h) cihê hev digirin. (i) û (e) jî cihê hev digirin.

Li gora van mînekan, ez gihame wateya (şe) ku kevir e.

Şikevt: Me got; ku kevirê kolayî ye. Ango (kevt) kolane.

Şikevtika dev, biçûkkirina şikevtê ye. Ew jî weku kolanekê, an jî em, bêjin qewartineke.

Şikevlatok, kîso (req)ye. *Ev ajel jî di nava şikevtokekê de ye; ew kevelê hişkî li ser laşê wê ye, ew jî weku kolanekê ye.*

Kavolî: Dewara stûr, ku dimre, se û gur nava wê û goştê laşê wê dixun; laşekî vala bi hestiyên xwe ve dimîne.

Kevel: Dema pezekê, dewarekê serjêdikin; goştê wê di eyarê wê de hûrdikin û ji rexê stû ve, di devê wî kevelî re derdixin. Kevel vale dimîne, û ew jî weke kolanê diyar dibe.

Paş vê şirovekirinê, ez gihame wateya du gotinan; şe ku kevire, û kevt an jî kev kolanek e qubikî û bi qeware ye. Em careke dî vegerin ser wan gotinê dumil, yên ku me bingehê wan naskirn:

Şikevt (şe û kevt), zayenda navê didoyê, ku navê kare (beşek ji makderêye) distîne. Zayenda navê kar mî ye û ji ber ku, şikevt navê cihek jî belo dike, zayenda wê jî mî ye. Şikevtika dev, biçûkkirina şikevtê ye, ew jî zayenda mî distîne.

Şekîv (şe û kev) zayenda navdêrê kolan (kîv) distîne, herweha şikestinek e, an jî kolanek e, û ji ber wan hoyan bi ci rengî be, gereke ew mî be.

Ferş: Me got ku fereşe ye (fere û şe) zayenda navê didoyê sitandiye, û nîr e.

Şihar, yek nave (şe yar e, ango bi kevire) û zayenda kevir ku nîr standiye.

Dîwar: Dîwar ji (dîtin û war) hatiye. Li dema pêşî, ku çend ber (kevir) li ser hev danîne; kurmancan jêre gotine hişkeber; ber (kevir) bi tenê bê herî, ces an çimento.

Vêce bi lêkirina wan çend beran, warê xwe pê nas kirin e û di baweriya min de ji bo vê yekê navê wî kirine dîwar (dibe ku ez şaş jî bim); warê xwe pê dîtin (dîtinwar). Ji ber ku war navê dawi ye, ji lew ra jî, zayenda nîr sitandiye.

Kendal: Cihek bilind; ku ji komek ax dirist bûye. û li bihtirê çaran ew kendal li ser keviya kortekê ye. Kend bi xwe cihê kolayî ye; xendeq, xendek û kendek yek wateye. Kendal, ji du gotinan pêk hatiye (kend û al). Axa ku ji aliyên kendê, kendal çebûye. û ji ber vê ye jî; ku kendal, zayenda nîr standiye. Hem jî ew kendal bilindayıyek peyda kirkiye, û bilindayıya li ser zevî zayenda nîr distîne.

Dibe ku hin bipirsin; çima kom zayenda mî standiye? Di bersiva xwe de ez dibêjim; ji ber ku kendal, ew koma axê ya ku dimîne û rengê xweristê distîne. Lê kom, li cihê xwe namîne, ku rengê bilindayıyeye xweristî bistîne, ji lewra zayenda mî distîne.

### 53. HEJMARNAV (jimarnav)

Li gor dîtina min, zayenda hejmarê dikeve jêr van xalên xwarê:

1- Eger hejmar navê yekê be, her û her zayenda nîr distîne.

Mînek: *Yekê (1ê) gulanê, cejna karkerên cihanê ye. Heşte (8)ê avdarê cejna jinên cihanê ye.*

*Didoyê nîsanê, nehê (9)ê nîsanê, dehê (10)ê mehê.*

*20ê mehê, cilê havînê, cilê zivistanê. cilê cil. Sedê bîstê, hezarê min...*

2- Eger hejmar navê didoyê be, zayenda mêt distîne. Mînek: *Ev jîna çarêye, ku Xelo tîne. Jîna yekê mir, jîna didoyê berda, û jîna sêyê ne bi dilê wî bû, ji lewra jîna çarê jî anî.*

*Gulê, eve mêtê çarê ye ku ew jî dike; mêtê yekê mir mêtê didoyê jî mir, mêtê siyê berda, ev mêtê niha, mêtê çarê ye, ew dike.*

Li vir, em dibînin ku hejmar navê didoyê ye, û divê ew zayenda mêt bistîne; kurmancan weha gotiye.

Eger me bigota, Gulê jîna çaran e, wate wê bihate guhertin, gulê namîne jîna mêtrekî, belê ew dibe a çar mêtan. Lê dema em dibêjin gulê jîna çarê ye, ango di rêtê de ew bû a çarê di nav jînen Xelo de.

Mînek: *Roja yekê, meha çarê, Sedê bîstê. cêname ku em bêjin sedê bîstan; ji ber ku ne bîst sedin, sedê dawî ku nimra wî bîste; ne nozdehe jî.*

3- Hejmara navdêra (yek) li gora wî navê ku cihê wî digre, zayenda mêt an jî nêr distîne. Û lêker di peyde têt, û bixwe jî bireser e..

Ji bo bersiva vê pirsê; *tu yê çend şebeşan bikirî?* Ezê yekî (şebeşekî) bikirim. Li vir em dibînin ku şebeş nêr e, yek jî, ya ku cihê şebeş girt nêr hat.

*Tu yê çend pertokan bikirî? Ezê yekê (pertokekê) bikirim.* Pertok mêt ye, yek ya ku cihê pertokê girt, ew jî mêt hat.

4- Lê jimarnav ji dudo û ta 20, gelejmar têt; dema ku hejmar li pêşya lêker bêt.

Mînek: *Tu yê çend şebeşan bikirî? Ezê çaran bikirim (çar şebeşan), ezê bîstan jî bikirim eger hebin.*

*Tu yê çend pertokan bikirî? Ezê bîstan bikirim.*

5- Hejmara bîst û yek (21) tê guhertin; di hejmara 21 ê de, em vedigerin ser benda didoyê, ya ku dibêje: Eger hejmar navê didoyê be, zayenda mêt distîne. Em dibêjin 20 û yek; hejmarnavê 20 û hejmarnavê yek.

Di kurdî de dibêjin: Jinek û mêtrekî kurd, kur û keçekte, ango her û her zayenda navê dawî distîne. Vêce li gora vê bendê, divê em weha binivîsin: Roja 21ê, ez diçim. Bi

wateya ku ez bibêjim roja yekê paş bîstê re, ez diçim (roja yekê) yek navê didoyê ye, divê mê be û bi (ê)yê tête tewandin.

Lê eger me got; roja 21 ê avdarê cejna Newrozê ye, di vê hevokê de, jimarnavê yek nêr e. Li vir careke dî mebesta me roja yekê ye û peywendiya wê yekê bi avdarê re heye, û (ê) ya hevbendî di nav herdu navan de (yek û avdar). Vêce em dibînin ku, yekê avdarê; li vir jimarnavê yek, navê yekê ye, ji lewra ew nêr hatiye.

Li gora vê mînekê, ez dibêjim, ku (22, 23, 24 û 29 jî), li ser wê rêzikê diçin.

Dema me got, jina didoyê; dido jimarnavê didoyê ye di rêzê de, û her û her zayenda mê distîne.

Roja 22ê, mebesta me roja 20 û 21 nîne; em rojekê dixwazin, ku roja didoyê paş 21ê, ango roja didoyê. ji ber ku 20 û 2 ev (û) bîstê ji didoyê cuda dike, û dimîne roja didoyê; divê mê be, ji ber ku, roj navê yekê ye û dudo navê dudoyê ye.

Di kurmancî de, dema çend navdêr didin pey hev, zayenda navdêra dawî distîne.

Dibêjin: *Deh siwar, pênc peya û kurekî genc li gel me hatin.*

*Bapîr, Xelo û Zînê hatin.* Her û her zayenda navê dawî distîne.

Vêce ez dibêjim di hejmarê de jî gereke weha be. û li gora vê jî, divê em bêjin: *Di sala 1957ê de, partiya dimuqrata kurdistan li Sûriyê damezraye.*

Jimarnavê (7) divê tewanga (ê) bistîne û ne gelejmar be. Ji ber ku, em salekê belo dikin; ne sala hezarî ye, ne a nihsedî ye û ne a pêncihî jî ye, sal sala heftê ye. û dema me got sala heftê; li vir hejmarnav ku heft e, dibe navê dudoyê û navê dudoyê di rêzê de, zayenda mê distîne.

Ji bo van hoyan jî, ez dibêjim ku şaşıyeke mezin dikin dema sala 1999an dinivîsin. Di vê barê de nivîskarên kurd bi sê rengan dinivîsin:

1) Komelek ji nivîskaran, tewangê bi kar nayênin û bi vî

awayî dinivîsin; di sala 1999 de, kovara Pêñûs bi zimanê kurmancî li Elemanyayê derket.

2) Celadet û bihtirên nivîskaran, yên ku di pey wî re hatin e û li dema iro, kom (gelejmar) dinivîsin bil ji (yekê) ku mî dinivîsin.

Tozik li ser nîne ku Mîr Celadet mamostayekî pir zana bû ye û ji me re gelek jî kiriye. Lê ew bi xwe di gelek babetan de bi vê wateyê gotiye, ku di karekî de dest pêdike û rê ji kesin dî re vedike, da ku hin zana, dibe ku ji wî baştır lê bikolin û encamin hêjatir bidin. Pirgal û rewşa ramyarî ya wê serdemê, ku mîr Celadet di nav de bû, hem jî dûrbûna wî ji komelgeha kurdewarî; hemî girê û asteng bûn di rêya wî de; neçarî hin şaşiyân bûye.

Gotareke Celadet bi navê (Kilasîkên me) di Hewarê de hejmara 33ê, dibêje: (*Melayê Cizîrî...dîwana wî di sala 1919 an de li Stenbolê ketiye çapê*).

Jimarnavê 19 kom nivîsiye. Li vir (19) bi yek nimre em wê dibînin û gereke sala 19 ê em binivîsin.

(*Jî eserên Batê... Mewlûda wî di sala 1905 an de li Misrê hate çapkîrin*)

Mamosta Celadet li vir jî, jimarnavê 5 zayenda kom (gelejmar) nivîsiye.

(*Mewlana Xalid...di sala 1242 an de li Şamê çûye rehmetê*.) Jimarnavê dudo jî kom danîye.

(*Nalî Jî şahirên Soran e. Dîwana wî di sala 1931ê de li Bexdayê çap bûye*.) Jimarnavê yekê, mî daniye.

Li gora ku ez li nivîsandinên Celadetî têdigehim; ewî jimarnavê yek (1) mî daniye, ji yekê bişûnde ta digehê 20 ê zayenda kom didiyê, jimar navên gurover, ku wî nav lêkiriye (30,40,..100...) zayenda nîr daye wan; her wekî di hawarê de jî di bingehê geramerê de raya xwe bi wî rengî dide. Bi wateya ku „hejmarnav ji 2 ta 20 gelejmarin!“.

Di raya min de Mîr Celadet Bedirxan, ji 2 û ta 20 ê ew şas çûye; herwekî min ji berî niha şirove kiriye. Herweha Nivîskarê kurd Arif Zêrevan jî vê rayê dibêje.

Celadet, her di wê gotara xwe de ya li ser kilasîkên me;

gotina Melayê Japa „Mele Mehmûdê Bayezîdî“, ji Kurdzanê Rosî Eleksander Japa re bi kurdî li ser hin kilasîkên kurd nivîsiye. Û Celadet wî bi Melayê Japa navdike.

Dîroka li dayikbûn û mirina wan wêjevanan bi vî rengê xwarê (Hawar, jimar 33 Mela Mehmûdê Bayezîdî dinivîse: „*Sahirê berê Elî Herîriye... di çar sed û heftê û yekê de merhûm bûye û di nav Herîrê de medfûn e.*“

A. Japa jî weke Celadet jimarnavê yek (1) zayenda mî daniye. Û di raya min de jî ev rast e.

„*Sahirê diwê Melayê Cizerî ye. Di tarîxa panned û cilî de dî nîv Cizîrê de peyda bûye.... Ev şex Ehmed jî di tarîxa panned û pêncî û şesê de merhûm bûye...*“

Melayê Japa „Mele Mehmûdê Bayezîdî“ jimarnavê gurover ku (40) e, wî jî weke Celadet zayenda nîr jê re daniye.

Lê Mela Mehmûd, dema dibêje: „Di tarîxa 556 ê de...“ jimarnavê 6 mî danî ye, wek ez dibêjim, ne wek Celadetî gotiye.

„*Melayê Batê, di tarîxa heşt sed û bîstî de peyda bûye*.“

Bîst jî zayenda nîr distîne.

„*şahirê pêncê jî Ehmedê Xanî ye... û di hezar û şest û sê da jî merhûm bûye.*“

Li vir, careke dî em dibînin bi pêçewanî Celadet; jimarnavê (3), zayenda mî sitandiye.

„*Şahirê heştê Miradxan e...di hezar û sed û nehê de merhûm bûye û di Bayezîdê de medfûne...*“

Li vir jî, em dibînin, ku jimarnavê neh (9) zayenda mî standiye.

Sebrî Botanî di vê barê de dibêje: „...ji sala 1944ê ve, ez û şîir bi hev re dijîn, lê ji sala 1946ê di zindana Mûsilî de, jîna min di gel vehandinê dest pê diket...“

*Li sala 1957ê ku dikandar bûm li Zaxo... „*<sup>44</sup>

Sebrî Botanî jî di van mînekan de, jimara navê dawî mî danîye.

6- Hejmarêni gurover her wekî Celadet Bedirxan nav lê

<sup>44</sup> Binêre li govara *Pirs. Hejmar* 15. Rupel 23.

kiriye, zayenda nêr distînin. *Tu yê çend şebeşan bikirî?*  
*Ezê sihî bikirim. Tu yê çend pertokan bikirî? Ezê 40 î bikirim. cilî bide min, sedî bibe “sed pertokan,,. Hezarî (1000 î).*

Dema em dibêjin ezê sedekî bikirim, ango yek sed e; bi wateya, ku çend sed hene, lê ezê sedekî bibim; eger sedê pêsi ye, an jî sedê çarê ye, yê pêncê ye; kîjan sed be, tu dibînî hejmarnavê sed navê yekê ye û divê ew nêr be.

Ji ber vê, ez dibêjim, ku jimarnavê gurover nêr hatine, an jî em dikarin bêjin, ku pêşiyên me weha bikar anîne. Rayeke dî jî ezê şirove bikim, da bidim xuyakirin, ka çima ev hejmaren gurover ji sihî û ta hezarî ew nêr hatine? Ez dibêjim di kirîn û firotinê de û li destpêkê; kirîn û firotina dar, pez û dewaran bûye. Kurdan dema pez û dewar difirotin; hejmara wan bi serîyan bû. Digotin, sih serî pez an jî sih serî dewar.

Serî jî zayenda nêr distîne. Lê dema dar difirotin, hejmara daran jî bi çend ta dar digotin.

Sih ta dar, an jî sihekî; (î) jî nîşana nêr e, ji ber ku tayek dar nêre, wek çawe serî jî nêre, ji lewra sihek jî nêr e; dema em dibêjin sihekî bide min, wek em bêjin yekî bide min.

Bavê min her û her digot; çend serî dewarê me hebûn. an jî digot, çend ta dar me difirotin.

Tişteke dî tê bîra min; ji yekê ta bîstan, eger tayêñ daran bin, an jî serîyên pez û dewaran bin, hejmara wan hesanî ye; bi awrekê re mirov dikare wan bihejmêre. Lê ji bîst û bi jor de dijwar e, û ji ber vê ez dibêjim, ku kurdan sihyek, cîlyek, pêncîyek... bi karanîne. Ji ber ku tayê dar û serîyê dewaran nêr bûn nîşana (î) li dawiya sihyek hate danîn. *Yek kur; korek; kurekî; kurî. Yek sih; sihek; sihekî; sihî, (sih serî).*

Di kurmanciyê de, dema ku , ji gelek tiştan birrek cuda dibe; ew bir nêr gotine. Refê teyran, Kerîyê pez, rivdê guran... Gelek teyr di asmanî re difirin, lê refek ji wan cuda dibe.

Pezê gundî gelek heye, çend kerişek jê çêdibin. Kerî

bixwe ji kerbûnê (parçebûn) hatiye, ji lewra nêr e.  
 Dibe ku, hun bipirsin çima garan zayenda mê distîne?  
 Garan (ga û ran), ran di kurdî de ajotin e; ango dibe navê kar, û ji ber ku, gotin zayenda navê didoyê distîne, û navê didoyê mîye, ew jî mê hatiye.

Li vir ez bi pêçewanî mamosta Arif Zêrevanî dibêjim; di raya wî de, ku jimarnavênu gurover jî, divê mê bin, ango em bêjin ka sedê bide min.<sup>45</sup>

#### 54. HEJMARNAVÊN ŞIKESTÎ (beşkirî)

NÎV

a) Dema ev jimarnav bi serê xwe ye bi (î) yê tête tewandin.

Mînek: *Nîvî bide min û nîvî ji xwe re bibe.*

*Bavê wan mir, malê xwe bi nîvî kirin.*

b) Dema jimarnavê (nîv) li pêşıya navdêrekê hat, zayenda nêr distîne.

Mînek: *Nîvê xanî firot û nîvê dî ji xwe re hişt;* mebesta min, ku wî hewşa xwe binîvî kir, nîvê wê firot û nîvê dî ji hewşê ji xwe re hişt. *Nîvê dexla xwe bi şînatî firot.* *Nîvê sêvê bixwe û nîvê dî bide birayê xwe.* *Nîvê şebeşekî heye, bi nan û sîrikê re bixwe.*

c) Eger jimarnavê (nîv) li pêşıya jimarnavan jî hat, zayenda nêr distîne. Mînek: Nîvê hezarî pêncsed e, nîvê çaran dudo ne, nîvê sedî pêncî ye.

d) Dema (nîv) dikeve paş jimarnavan, an jî bikeve paş navdêrekê, tewanga wan distîne.

Mînek: Ji çar û nîvan bihtir; (an) nîşana gelejmarê ye, ji jimarnavê çaran sitandiye.

*Bîst sêv û nîvan bide min; ev (an) a bîstan e bi nîvê ve bûye.*

*Cil û nîvî bide min;* (î) ya tewangê ji cilî wergirti ye.  
 Sêvek û nîvê; ev (ê) ya ha tewanga zayenda mê a sêvê ye.

*Şebeşek û nîvî bide min;* ev (î) ya ha tewanga zayenda

<sup>45</sup> Binêre li Arif Zêrevan, jêdera berê r. 74.

nêr a şebeşî ye. Dempîvek û nîvê; ev (ê) ya ha tewanga zayenda mê a dempîvê ye.

Şikestekên ji nîvê biçüktir; sêyek, çaryek (çarêk), pênciyek,.. dehyek (dehek).

Ev şikestek herûher zayenda mê distînin.

Mînek: *Sêyeka malê te ji xweha te re dikeve, ango ji bo wê ye. Dempîv yek û çarêkek e. Rêya me çarêka dempîvê nakişîne.*

*Heso mir; çarêka malê xwe daye mizgevtê. Pênciyeka min di kargehê de heye.*

Sêyek; yek ji sisêyan. çaryek (çarêk); yek ji çaran. Heştyek (heştêk); yek ji heştan. Dehyek (dehek); parek ji deh paran. Ezê sêyeka berhemê bidim te... Şeşyeka dexla şîn ji te re...

## S E R K A N Î

- Celadet Bedirxan, *Kovara Hawarê*. Bingehêن giramera kurmancî. Hejmarêن 30, 31, 32, 33, 34, 35, 37, 42, 43, 44, 47, 48, 50, 51, 53, 54. Weşanêن *Nûdem*. Stockholm 1998.
- Sebrî Botanî, Kovara Pirsê. Hejmar 15, payîza 1998. Rûpel 21-25.
- Arif Zêrevan, *Bingehên rastnivîsandina kurdîyê (kurmanciyê)*. Stockholm 1997.
- Qenatê Kurdo, *Gramera zimanê kurdî (kurmancî soranî)*. Weşanê Roja Nû. Stockholm 1990.
- Sieglinde Messerschmidt, Jotyar Bamernî: *Rêzimana elmanî kurdî*. Amed Verlag. Lahr/Schwarzwald. 1994.
- M. Emîn Bozarselan (amadekirin). *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Weşanxana Deng. Swêd 1995.
- Zeynelabidîn Kaya, M. Emîn Nazorî (amadekirin). *Melayê Cizîrî*, Weşanê Roja Nû. Stockholm 1987.
- Reşîd Kurd, *rêzimana kurdî*. Weşanên kombenda Kawa. Beyrût 1990.
- Memo Yetkîn (amadekirina bi tîpêñ latînî): *Feqê Teyran, Şêxê Sen'anî*. Weşanê Roja Nû. Stockholm 1986.
- Zeynel-abidîn Kaya (amadekirin). *Mele Ehmedê Batê, Mewlûd*, Weşanê Roja Nû. Stockholm 1987.
- Deham Evdilfetah, *Hindek aloziyêñ zimanê kurdî (kurmancî)*. Dîmeşq 1993.

Berhemên Keça Kurd yên çapkirî:

1. Keça Kurd: *Qesara min* (Helbest). Beyrût 1996.
2. Keça Kurd: *Kopê Qurbanî* (Helbest). Beyrût 1996.

Ev çend pertokên xwarê ji zimanê erebî wergerandine ser zimanê kurdî:

1. „*Cîrokine helbijartî*“ ji çîrokên Ezîz Nesîn. Beyrût 1990.
2. Mihemd Mele Ehmed: *Xoybûn, civata „serxwebûn“a kurdî (1927-1946)*. Şam 1993.
3. Mihemed Mele Ehmed: *Peywendiyêñ Kurd û Ermeniyan*. 1994.

# Ferhengok

# فرهنج کوچک

Kurdî	فارسی	English
Ajel / Ajal / kerî	گله حیوانات، جانور	Flock , Herd
Alav	ابزار	Tool
Ax / Xak	خاک	Soil
Biçûk / Qiçık	کوچک	Small
Bireser / Berkar / Berkirde	مفعول	Object
Çek	تجهیزات نظامی	Armour
Çelek	گاو ماده	Cow
Çêlik	جوچه	Chicken
Cînav	ضمیر	Pronoun
Cotebêje / Cotepeyy	كلمات دوتابی	Pair of words
Daçek / Pirtik	حرف اضافه	Preposition
Dem	زمان	Tenses
Dema ayende (bihê / bê)	زمان آینده	Future tense
Dema borî (berê)	زمان گذشته	Past tense
Dema niha	زمان حال	Present tense
Derbas / Redbûn	عبور کردن، رد شدن	Cross, pass by
Diri	تمشک	Blackberry
Divê	بایستی، لازم بودن	Should, shall
Erd / Herd	زمین	Earth
Erêñî	مثبت	Positive
Gelejimêr / pirhêjmar	جمع	Plural
Gelek / Pir	خیلی	Many , very
Gelempêrî / Omûmî	عمومی	Generally
Gemar	کثافت	Dirt , filth
Gerguhêz	متعدی / فعل متعدی	Transitive
Gewrî	گلو	Pharynx
Gihanek	حرف ربط	Conjunction
Guhestîn	نقابیه	Vehicle
Hêjmar / Mêjer / jimar	شمارش	Number , count
Hemware / Hemenî	هم معنی	Synonym
Hêrtin	خردکردن	Grind
Hesin / Hêsincaw	آهن / ابزار آلات	Iron , tool
Hevdeng	هم صدا	Homophone
Hevedudanî / Hevdanî	ترکیبی	Compound
Hevnav	همنام	Common noun
Hevok	جمله	Sentence
Hoker	قید	Adverb
Îzeh / îzah	عنصر	Element
Kehrebê	برق	Electric
Kirde / Kiryar	فاعل	Subject
Kit / Kîte	سیلاپ، بخش	Syllabus
Kok / Rîşe / qurne / binî	ریشه	Stem / Root
Kolan	خیابان، کندن	Street , Digging
Kuce	کوچه	Street , lane
Kurt / qol	کوتاه	Short
Lêker / Lêkar	فعل	Verb

Lêkolîn	تحقيق کردن / کند و کاو	Research
Lewre / Loma	بهمین خاطر، برای	For
Leystik / lîstin	بازی، رقص	Game , dance
Makder / Mesder / Rader	مصدر	Infinitive
Malbat	خانواده	Family
Mê	ماده، مونث	Female
Meşîn / Rêçûn	راه رفتن	Walking
Mîrat	میراث	Heritage
Mirov	آدم / انسان	Man
Nebinavkirî / Nenaskirî	مجھول، مبهم، نامعین	Indefinite
Nêr	نر، ذذكر	Masculine
Nérîn / Dîtin	ذگاه، دید	Look, opinion
Neyînî	منفی	Negative
Pesn / pesin	ستایش / لاف	Praise
Pêwîst	لازم	Necessary , need
Peyv / bêje / keleme	کلمه	Word
Pirç	مو	Hair
Pîsî	کثافت	Dirtiness , filthiness
Pîvan	قیاس، اندازه گیری	Measure
Pronav / Cînav	ضمیر	Pronoun
Qaf / qilîf	دیگ، قابلمه	Pot
Qaşîl	پوسته	Peel
Qereçî	کوهلى	Gypsy
Qertaf / xurdebêje / pirtik	اضافه، وصله، وند	Affix
Quncir	چوب نوک تیز / بته خاردار	Thorn
Rawe	حالت	Mood
Raxistin	فرش	Carpet
Razber	خلاصه، چکیده	Abstract
Rengdar / rengdêr	صفت	Adjective
Rêziman	دستور زبان	Grammar
Rîs	پشم رسیده	Wool
Serkanî / Çavkanî	منبع	Reference
Şînî / Hêşînî	سیزیجات	Vegetables / Greens
Sitirî	درخت یا بوته یا چوب خاردار	Thorn
Taybetî / xisûsî	خصوصی	Especially
Têbînî	نظر، توضیح اضافی	Opinion , footnote
Tevn / tewn	فرش در حال باقتن	Weaving , textile , loom
Tewandî	کنایه شده، کچ شده، تصریف شده	Oblique
Tewang	کنایه، کچ، خمیده	Inflection / declension / conjugation
Tîp	حرف	Letter
Vegetandek	وند ، اضافه	Article / Affix
Vegetandin / vejetîn	جدا کردن، جدا شن	Separate from, set apart
Wate / Menî	معنی	Meaning
Weha / Haka / Wisa	اینطوری	Likewise
Xwerû	اصلی، ساده	Original, simple
Zad / Taxil	غلات	Grain
Zayend / Cinsîyet	جنسيت، زايش	Gender
Zevî / Zemîn	زمين	Earth

Mamosta Keça Kurd, di vê pirtokê de, destê xwe deydine ser cihêşike terma zimanê me, û ewa berxwedide, ku bi nirîn û şirove-kirinên zanistî, wê kûlê derman û çareser bike.

Di baweriya me de, ev pirtûka dikare şûneke zor giranbuha dî nav cihderên zimanewanî, zanistî de bistîne, û roleke berçav û payebilind di çareserkirina janekê ji janên zimanê me de bilîze.

Herwisa jî, ev berheme dikare ji lêgervan, nivîskar û xwendevanên zanîngehêن kurdî re, bibe çavkaniyeke pêwist û suddar.

Dr. Ebdilmecît Şêxo



ISBN 3-926522-26-7